Olay yerine ilk varan Sınır Tanımayan Doktorlar ekibi, hardal gazı kullanıldığını teyit etti. Belçikalı ve Hollandalı doktorlardan oluşan bu ekip, kullanılan zehirler arasında muhtemelen siyanür de olduğunu bildirdi. Katliamdan yaralı kurtulanların bazıları kalıcı hastalıklara yakalandı.

**"Vaadler yerine getirilmedi"**

2003 yılında devrilen Saddam Hüseyin, Kürtlere karşı yürüttüğü Enfal Katliamı kapsamında 180 bin kişinin ölümünden sorumlu tutularak yargılandı.

Ancak Duceyl Katliamı nedeniyle aldığı idam cezasıyla 2006'da asıldı. Ölümünün ardından ise Kürtlere karşı "soykırım" uygulamaktan yargılandığı davada suçlu bulundu.

Saddam Hüseyin'in "Kimyasal Ali" lakaplı kuzeni Ali Hasan el Mecid ise 2010 yılında, aralarında Halepçe Katliamının da bulunduğu zehirli gaz saldırılarının emrini vermekten idam edildi.

1 Mart 2010'da Irak Yüksek Ceza Mahkemesi Halepçe Katliamı soykırım olarak tanıdı. Kürdistan Bölgesi hükümeti tarafından bu karar memnuniyetle karşılansa da, Bağdat yönetimi tarafından Halepçeli ailelere gereken destek verilmedi, vaadler yerine getirilmedi. Tarihe kara bir leke olarak düşen bu katliamın acıları ve anıları Kürt halkının hafızasında hala ilk günkü kadar taze.

# Maliki'den Bağdat ve Erbil arasındaki sorunların çözümüne ilişkin açıklama

**Maliki:** Kürdistan Bölgesi ile olan sorunlar petrol ve gaz kanununun hazırlanmasıyla



çözülür.

Irak Kanun Devleti Koalisyonu lideri Nuri el-Maliki, petrol ve gaz yasa tasarısının 2007'den bu yana parlamentoya gönderildiğini ancak yasanın raflarda kaldığını söyledi. Maliki, petrol ve doğalgaz ve maaş konusu başta olmak üzere Erbil-Bağdat arasındaki ilişkilere yönelik açıklamalarda bulundu. Kanun Devleti Koalisyonu lideri, "Petrol ve gaz kanununun hazırlanmasıyla sorunlar çözülecek, bu yapılmadığı takdirde Kürdistan Bölgesi ile petrol ve maaş sorunları çözülmeyecek ve bitmeyecektir." değerlendirmesinde bulundu.

Açıklamasında Maliki, "Petrol ve gaz yasa tasarısını 2007'den bu yana parlamentoya gönderdiler ama raflarda kaldı." dedi.

Petrol kaynaklarının mülkiyeti ve petrol sahalarının yönetimi, Kürdistan Bölgesi Hükümeti ile Irak Hükümeti arasında en çok tartışılan federal petrol ve gaz yasasının ana konuları arasında yer alıyor. Yasa, Kürdistan Bölgesi ve Irak'ın tüm bölgelerindeki tüm petrol faaliyetlerini etkileyecek. Petrolün aranması, geliştirilmesi, üretimi, bileşenlerinin ayrılması ve toplanması, depolanması, taşınması ve satılması sürecine ilişkin tüm faaliyetler bu Kanunun içeriğine uygun olarak uygulanacaktır. Erbil ile Bağdat arasında petrol meselesine ilişkin sorunlarda birkaç aşamadan geçilerek defalarca anlaşmaya varıldı ancak anlaşmalar hiçbir zaman olması gerektiği gibi hayata geçirilemedi. Kürdistan Bölgesi Hükümetinin Mesrur Barzani başkanlığındaki dokuzuncu kabinenin kurulmasının ardından hükümet, sorunların çözümüne yönelik adımlar attı ve bu, dokuzuncu kabinenin gündemine de tam olarak yansıdı. Mesrur Barzani, göreve başlarken yaptığı açıklamada Bağdat'la sorunların anayasaya uygun şekilde çözülmesi gerektiğini vurgulamıştı.


# HELEPÇE TU ÇAR JI BÎR NAÇE

**Sala 1988-ê 6-17-ê adarê, dema ku gul û sosin hawîldor xwaşbûn dikirin û bihar bi lez berbi Newrozê va diçû, dîrok carek din vegerîya ser bextreşîya kurd. Pelên darê hêşîn di nav xwînêda "xemiland", xwîn barîya bi ser jîyana kurdayetî va. Belê, ev ne yekem car bu ku gelê kurd, ketibû binê gullebaran û tîr barana dujmin, zar û zêç, pîr û çîwan, jin û mêr, bi kurtî hemu heyber û jînîyên xwezaya bajêrê Helepçê li ber çavê dost û neyar, di naverojek sayî û aramda, di bin bombeyên kîmyayî yên Seddamê rûqirêjde, kûtayî bi jîyana xwe dida. Esmanê hêşîn, ji firîna firokan toz û dûmanek sor direşand, jehrê bi ser rûyên mirovên bê gune û bê suçva, wekî tavîyên baranê dibarîya û gelên meye bê kes yek bi yek li Helebçê bi ser axa sarva, diwergerîya û axrîn nefesa xwe dida… Xopan bû, tofan bu herder, xwîn wekî lehîya avê di nezaranda diçun xwar.**

Kurdistan tu carî li bin darê zulmê star nekirîye. Gellek caran li hinberê zordarîyê gelê kurd bi mêrxasî rawestîyaye û ber xwe daye . lê dujmin firsend û mecal nedaye ta ku pirsîyara kurdî di zirûfên aştîyane de bête safî kirin. Dewletên dagirker mixrîkên nav beyna xwe da, carcaran dev avîtine hev , şer û qirên kirine, lê ev şer û qelasîya wan her li ser axa derbas bûye. Ji vî alîva kurd hatine kuştin û welatê wan pêpez buye, ji wî alîvajî dîsa her kurd telef bune. Li dawîyê di şerên navbera du desthelatdarên dagirker da ha kurda xisarê tîtine. Kî ji wana di şerda têk çû bê dîsan, di palêk de, di babeta kurdayetî da serkevtî hatîye hesavkirin. Di şerê Îran û Îraqêda jî,kîjan têk çûbe bila here kurd bi xwe divî şerîda herçend bêalî jî bin dîsa xisar kirine û welatên wan ketîye ber bombebarana dujmina.

Ev cara yekemîn nebu, ku Seddamê hov êrişa hewayî bi ser gelê kurdva dianî. Ev kîn û rik û xezeba rêjîma nijatperesta Îraq, ji mêjve tê berî çend sala wan dîsa bomba napalm avîtibu Kurdistana Başûr û dîsan bi hezaran kurd bibûne penaber û ji bona sitarekî bi ser av û şetan va ketîbû. Kurd ji bona starê wê demê xwe avîtibûn tor û bextên Îranîyan. Her çend bizanîya ku Îran jî ne doste, lê çawa bikirana mefer tunebû ji bo starê cîyê herî nêzîk Îran û Kurdistana Îranê bu. Kurdistana Îranê wê demê di bin bandurîya rêjîma Îranêda maye. Bi hezaran mirov hatibu kuştin,nêzîkî 3000-r malbat têk çûbû ,mal û xanî û debar hemî ji ber bombebaranê wêran bibu, gelo gunê kurda çi bû? Kurda xwe li dijî êrişa diparast û ne dixwastin ku şer welatê wan xopan bike.

Di sala 1988-a Seddam li ser yek êrişî 75-c navçeyên Kurdistanê kir. Ev êriş bi balafir û frokê hate kirin, bar û avêjên wan jî jehrîya kîmyayê bu. Bingehê pêşmergên navçê Zaxo LEQ -a 1-ê, bi erdêra bû yek. Kurdan nekarin xwe li himberî cekên kîmyayî ragîrîn. Wê roja reş, nêzîkî 10 000-r kurd hatine qelandin û kuştin, wekî 20 000-an jî birîndar bun û ewên din



Tahir Silêman zîyareta Helepçêda

jî ku jimara wan digihîşte bi sed hezaran, li çar alî bela bun hewarîya xwe ji hemu cîhanêra beyan kirin.

Ew weşeta nedîtî, dîyare wê çendîçend sal wê bîra meve, û wê bê neletkirin. Ev qetlîyamek, mrovkujîyek gelek mezin bu. Lê bê dengî hertim û hertim beşê kurdaye kesî guh neda dengê nalîna zarokên kurd. Seddamê faşîste xwînxwar dixwast ku gelên kurd ceza bike .Bi rastî jî ev ceza gellek giranbu. Wî dixast ku li ser axa kurdan navçeyeke vala û taybetî pêk bîne. Çekdarên kurd serê ewil vî navçeyê bombebaran kirî bernedan û bi qederê karîna xwe li ber xwe dan. Lê, ji heft beş artêşên Îraq sê beşên wî di vî opêrasîonêda beşdar bibun û ev hêz jî qabil nebu ku bi hêsanî têkhere û bişkê. Cehşên hindur jî li pişta artêşên xwînrêj li dijî gellên xwe şer tikirin. Pêşmerga ji alîyekva jin û zarokên kurd ji ber vê wehşetê direvandin, ji alîyek dinva jî, bi cekên destane li himberê debabe û frokeyên rêjîma nîjatperest şer tikirin.

Kurdên Helepçê vî alî, wî alî, bi perîşanî û bê kesîyêda revîn xwe spartine Turkîyê û Îranê. Sere ewil Turkîyê sînorê xwe girt lê paşê dît ku badilhewaye, kurd kurda li devra nahêle, sînor vekir û ji sed hezaran jortir kurdên Îraqê hatine Turkîyê. Birçîtî, neçarî, bêdermanî û tezîtîyan wan bi çî wekî mirovan jî rêjîma Turkîyê ru neda wan. Her wek ku dîlên şer bûn bi grew hatibûn girtin. Li Mêrdîn, Dîyarbekir û Mûşê bineçîyên sitarê nîşan da û çend kon û hinek xwarin û wexarin da wan, tu heqek penaberî li kurdanra nas nekir. Kurdên hatî di kanpên xweda her wek hêsîr û dîla di nav neçarîyêda xwe ji bombên kîmyayê parastin. Lê bextreşîya kurda li vir jî domand. Lewra gelek car hêzên ewlekarîya Turkîyê jehrî û dermanê mirinê avîtine nav xwarin û vexwarina kurdên penaber û her weha serok û pêşmergên hatî bi dizî û xef-xef dane rêjîma zordesta Îraqê. Mixabin, ev hemû hovîtî û qirkirin bin çavê cîhanê didomîya û kesek pêşî li vê rewşa xerav û ne mrovî nedigirt. Denk ,ji bîr û raya cîhanê û bi taybetî ji hêzên pêşverû û dêmokratên Turkîyê jî dernediket.

## Kesî li halê kurda nedipirsîya

Bi rastî jî, buyera Helepçê qezîyake gelekî mezine. Careke din hate dîtin ku,kurd divê, dost û dijminên xwe baş ji hev cuda bikin. Di hemû perçeyên Kurdistanêda li ku derê dibe bila bibe, dema ku leyzek li ser çarenusîya kurd bê leyîstin, rêxistin û sazumanên kurdewarî hev her tim baş agadar bikin û ji hev bi xeber bin, piştovanî û pişt kirîya hev bikin.

Vaye çendin care ku dijmin bi ser kurdada agir dibarîne,sedem ku nikarîne li cîhanê dengê xwe bilind bikin,kesek xwe negîhandîye hewara kurdan. Gelek car dujmin kurda bi xwe berdaye hev û ew xwe daye alîkî temaşa şerê brakujîa kurda kirîye. Hêzên welatparêzên kurd jî bi dijmin xapîyane dest avîtine pêsîra hevdu û li dawîyêda doza Kurdistan bê hêz û bê deng maye. Gelek kurdên xwaîn û xwefroş jî mafên kurdayetdî firotine dijmin û bi rûreşî li gel dujmin cî girtine.


Di hemû beşên Kurdistanê de, dema pirsa kurdî hatibe holê, hemî rexên dijmin bi hevra yek dengî kirine û li dawîyê xwaşbinyek mirovatî ji, Kurdan re nasnekirine. Her wuha dewletên dijî maf u azadîya kurdan, her daîm, di nav xwe da gelek peyman û destbirakîya dizî û eşkere danîne. Wekî tê zanin di dîroka kurdan de gelek caran çar dewletên dagirker alîkarîya hev kirine û her tim hevkar bune. Dema ku tevgera kurdî li beşekî Kurdistanê pêşve çuye, nêzîkayî li edlahî û azadîyê kirîye: pêra û xof ketîye dilê wan zordarên beşên din. Ewana xwastine ku kurd her tim bindar bimînin.

Her yek ji wan xwîn û heyîna kurda bi hêsanî bimêje. Ew di nav hevdu ji hev bi xeber bune; lê pir mixabin ku kurdan firsend û mecal netîtîye ku ew ji di nav xwe da şêwr û mişawirayek daynin,yekitî û hevkarîyek çêkin û cîhanê deng bidin. Dîyare xêra dujminên kurda ji kurda ra tune ye. Yekem dostê kurdan,pêşîn kurd bi xwe ne. Kurdên hemî beşên Kurdistanê birayê hevin û giringe her kesek ji bo azadîya Kurdistan di mercên xwe yên taybetî de serbixwe be û gerî kurd, di beşê xwe de ber bi rizgarî edlahîyê ve bibe. Helepçe, wekî Hêroşîma û Nagasakî bû. Di serdema îro de, ev buyer li ser navê mirovahetîyê rûreşîyek mezin e, sûçek girane. Bona wêjî Seddam û hevkarên wî di dadgehê hatin dadigekirin û caze dardakirinêva emelên xwe "şûştin". Gelê kurd û dostên wî tu carî Helepçe ji bîr nakin. Kula helepçê zû bi zû ji dil naçe. Hêvîdarin ku ne kurd tenê, lê hemû gelên cîhanê carek din mirovkujîyek wiha nebînin û li çar alîyê cîhanê aştîyek pêt bidamezirandin…..

Amade kir: Tahir Silêman

570:1.QXD 17.03.2024 13:37 Page 10





**Əsəd Ərbil**

# Ənfal

**Arayış:**

*1-ci Səddam rejimi tərəfindən 7000 Kürd ailəsi Ərbil, Duhok şəhərlərindən alınaraq diri-diri onları toplu məzarlıklara basdıraraq ictimaiyyətdən gizlətdilər.*

*2 -ci Hələpçə qəsəbəsində və ətraf kəndlərində isə qadağan olunmuş kimyəvi bombaları mülki insanlara qarşı istifadə edərək bu rejim, minlərcə insanı şəhid etdilər.*

*Bu şeirimi insan haqqı olaraq o, Şəhidlərə yazmışam:*

İnsanlarda
Qaranı ağı fərq etməm
Hamımızı bir nəsnə toplar
Oda kutsal
İnsan sözcüyü.

Ey Ənfal ailələri ...
Ey Hələpçənin
Şəhid ana və ataları,
qardaş bacıları :
Dəyəriniz başım üsdə,
Qəlbimdə də
Adınız və yeriniz vardir.
Bizdə Türkmənlər
Sizin gimi
Acılar çekdik,
Qurbanlar verdik,
Üç ağaca da asılmışıq,
Sürgünlərədə
Götürüldük zorla
Yoxsa da zorla.

Bunlara rəğmən
babalarımız şərəf meydanını
heç buraxmadılar
Topraklarımızı savunarak
Şəhid düşdülər
Ama topraqlarsa
Özgür qaldı.

Bizimdə sizin kimi
Dul analarımız
Zülmə dirəndilər
Mərdlik südünü
Bizlərə əmizdirdilər.

Mən bir Türkmənin
Şəhid qardaşıyam
Ki vətən uğrunda
qanını tökdü,
Sizin şəhidlərinizdə qardaş idilər
Güney Afrika da belə
Yapon, Kore və Bosna Hersiktə də
Şəhid düşən qardaşımdır,
Bunlar vətən, Millət və Dil
Yçün şəhid olmuşlardır.
Öz yarama rəğmən
Sizlərə də acıyıram
Ənfal olduğunuza
Hələpçədə yasak atom
Və Kimyəvi
Bombalarla vurulduğunuza
Sizində yaranız dərindir
Deməm dərin deyil
Tıpkı bizim kimi.

Bu olaylarda bütün Dünya
Gözü önündə vuruldunuz
Ama kimsə səsini çıxartmadı.

Yüzlərcə Təzə Hurmatuda
Kurşuna düzülən
Gənç Türkmənləri
Şəhid etdilər
O, zalım rejim adamların
Qırılmış əlləriylə,
Ürəyi olan
Onlara acıdı
canlar və sümükləri
Birbirinə qarışdı
Ayni Hələpçədə
Düşən şəhidləri kimi
Canla tənləri tanınmadı
O, düşən şəhidlərin
Ət sümüklər toplanaraq
Cənnəttə ....
Təzə Hurmatu
Və Hələpçə ilə
Ənfal şəhidləri
Birləşdilər və qol qola
Ataraq öpüşürlər.

İnanın könlümüzdə açılan yara
Çok dərin və böyükdür
Bizlərdə də rejim adamlara
Az zülüm etmədilər
Asimilasyon siyasəti
Qədərincə uyguladılar
Və çox dəyərliləri
Qayb ettik, itirdik

Sizidə kor olmuş
yasak olan ...
Napalım və uluslar arası
Yasak bombalar
Və insan hakları xaric
Kimyasəl və Biolojık
Silahlarla sizləri vurdular
Kimsə gəlmədi
bu zülmü durdurmağa
Kimsədə səsini belə çıxartmadı
İstədikləri qədər
Vurdular, güldülər və öldürdülər.
Bu insanlıqdan uzaq olaylar
Sizləri Dünyaya tanıtdırdı
Ənfal və Hələpçə olayları
Kürd xalqının simvolu oldu.
Verdiyiniz
Hələpçə, Balisan və Barzanda
Və verdiyimiz Ərbil, Kərkük
Köprü, Talafar və Tuz Hurmatuda
Bütün şəhidlərimizin
Tökülən qanları bir olub
onların sayəsində
Azad və ozgür olduq
özgür parlamentimiz
və Hökumətimiz vardır
Bu kutsal şəhidləri unutmamalıyıq
Onlar ölümsüz oldular
Və özgürlük məşəllərini yandırıb
Yollarımızı
İşıqlandırdılar, aydınlatdılar
Bizlərdə onların izindəyik.

Yaşasın XalqlarınBirliyi ...
YaşasınXalqların Qardaşlığı ...
Yaşasın İnsanlığın Özgürlüyü.




# AX FELEK

Ax felek, wax felek, bê îtbar, felek,
Tu sîyar, em peya, te nagrin, felek,
Em hene, em dijîn, dizêrin, felek,
Careké rûyê me bikene, felek.

Neyar hat, hebûn bir, şa bûyî, felek,
Em kaliyan, naliyan, seqirîy, felek,
Zar maşyan,dê giryan, ne hatî, felek,
Carekê rûyê me bikene, felek.

Kasil bûn, rêncîyan dûmeka, felek,
Afrîkê zengê reş aza bûn, felek,
Netirse xemêd me sivike, felek,
Carekê rûyê me bikene, felek.

Tew millet, bûn xweyî mal-rusqet, felek,
Erd yê me, em mane bê welat, felek,
Em dimrin, tu dîsa kivş nabî, felek,
Carekê rûyê me bikene, felek.

Mirî çûn, em zindî hûrxwaş bûn, felek,
Tirbên me bin tanga pêpez bûn, felek,
Kanên me neyara kişandin, felek,
Carekê rûyê me bikene, felek.

Mergên me, deştên me, bedewin, felek,
Mal ya me, em têda firarin, felek,
Avên me dikişin, em tîne, felek,
Carekê rûyê me bikene, felek.

Me Rustem da, Sulheddîn da, ingirîy, felek,
Me Feqî da, me Xanî da, xeriqîy, felek,
Em binisîn, em çilmisîn, nehatî, felek,
Carekê rûyê me bikene, felek.

Helebce tew bû jehr, geş bûyî, felek,
Çûk helyan, em nalyan, te xwaş hat, felek,
Mêr mirin, keç zeryan, tu ku bûyî, felek,
Carekê rûyê me bikene, felek.

Qasim hat, Seddam hat, doş bûyî, felek,
Kemal hat, Cemal hat, geş bûyî, felek,
Teyara em kuştin, te fêz da, felek,
Carekê rûyê me bikene, felek.

Pir dergûş, ser berfa qerisîn, felek,
Hêleçan vala man, te xwaş hat, felek,
Xortê qenc, dotê baş, qir-qut bûn, felek,
Carekê rûyê me bikene, felek.

Şewlê dûr, gelyê kûr, betilîn, felek,
Çemê gur, ser me da miçiqîn, felek,
Bextê me tim reş bû, tu kuyî, felek,
Carekê rûyê me bikene, felek.

Xwedê em dergê xwe avîtin, felek,
Ser erdê em rehet qet nebûn, felek,
Birîn me axivîn, te kew neda, felek,
Carekê rûyê me bikene, felek.

Em Kurdin, qels nabin, bîr meke, felek,
Pêş dijmin, ber zûlmê narevin, felek,
Yan mirin, yan Welat, dew eve , felek,
Carekê rûyê me bikene, felek.




## İNDİ YALAN, YALAN KÜRDƏM

Babam Nəbi, nənəm Həcər,
Əsli bəlli ərən Kürdəm.
Namərdləri, şərəfsizi,
Mərd önünə sərən Kürdəm.

Göz açmışam at belində,
Qara sazın zil telində,
Dəlidağın Kürd elində,
Kürd bətnindən doğan Kürdəm.

Mərd anadan igid doğan,
Nəsilindən qeyrət yığan.
Dar qəfəsə geniş sığan,
Hər cür sınaq görən Kürdəm.

Zirvələrdən nərə çəkən,
Beqeyrətin qanın içən,
Yaxşısını pisdən seçən,
Haq yerını bilən kürdəm.

Qartal kimi qayalarda,
Şahin kimi səmalarda,
İgid kimi davalarda,
Kürd izini, qoyan Kürdəm.

Sərt qayadan məğrur keçən,
Bal bulaqdan şərbət içən,
Dağ döşündən lalə biçən,
Saf çiçəyi dərən Kürdəm.

Düşməninə əyilməyən,
Ayaqlara geyilməyən,
Qiruruna yenilməyən,
Kəhər üstə, kürən Kürdəm.

Millətinə mərd yarıyan,
Haq yarasın hey sarıyan,
Şərəfini tək qotuyan,
Haqsızlığa dinən kürdəm.

Döyüşlərdə döyülməyən,
Qeyrətinə söyülməyən,
Polad kimi əyilməyən,
Tən ortadan sınan Kürdəm.

Indi mərdi görünməyən,
Yağla-şoru bilinməyən,
Vətən dağı silinməyən,
Qürbət eldə viran kürdəm.

Pəran düşdü doğmam, yadım,
Küskün oldu ismim, adım,
Eşidilmir gurd fəryadım,
Əzəməti talan Kürdəm,
İndi yalan, yalan Kürdəm.




# LAÇINDA

Möhlət ver, ey tanrı, möhlət ver bir az,
Laçın azad olsun, ölüm Laçında.
Öpüm torpağını ölümdən əvvəl,
Bir dinə-imana gəlim Laçında.

Axsın ağ suları qoy axım-axım,
Qırxqızın döşünə ay-ulduz taxım.
Zəfər bayrağıma vüqarla baxım,
Ölümün üzünə gülüm Laçında.

Könlüm qanad açsın dağlar boyunca,
Lalələr sayrışsın ulduz sayınca.
İçsin Həkəridən, içsin doyunca
Bu təşnə dodağım-dilim Laçında.

Ah çəkib qayalar, daşlar ağlamış,
Kimsəsiz gədiklər el soraqlamış.
Göllərin aynası qubar bağlamış,
Özüm qubarını silim Laçında.

Ağlar gözlərimlə Kürəm, Arazam,
Qüdrətim çatarmı bu dərdi yazam.

Nə vaxtdan həsrətlə köklənmiş sazam,
Sevincə köklənər telim Laçında.

Gözəllər gəzdikcə yaşıl yaylağı,
Səngisin sinəmin göynəyən dağı.
Atamın yurdunda sönmüş ocağı
Qalasın, yandırsın əlim Laçında.

Kürdoğlu qalmasın dünyada naçar,
«Bir yandan bağlayan bir yandan açar».
Məzarımın daşı şəfəqlər saçar,
Məni basdırarkən elim Laçında.

4 *10.X.1998*

# "Deskeftiyên Kurdistanê ji berhema xebata Barzaniyê Nemir in"

14 adarê Îro 120 saliya jidayîkbûna Barzaniyê Nemir bavê ruhanî yê neteweya Kurd e, Pêşmergeyên herdu şoreşên Îlon û Gulanê jî dibêjin, pêwîst e û erk e jî ku hemû Kurdek li ser rêbaza pîroz a Barzaniyê Nemir berdewam be ji bo ku Kurd bighên hemû mafên xwe, ji ber ku ew destkeftên niha berhema xebata Barzaniyê Nemir in.



Pêşmergeyê herdu şoreşên Îlon û Gulanê Sidîq Goran ji malpera fermî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê KDP.info re ragihand: "Îro 120 sal bi ser jidayîkbûna Barzaniyê Nemir bavê ruhî yê neteweya Kurd derbas dibe, ku rojeke geş e ji bo Başûrê Kurdistanê. Ji bo herçar parçeyên Kurdistanê rojeke geş e, ji ber vê yekê divê em hemû li ser rê û rêbaza pîroz a Barzaniyê Nemir berdewam bin û em xizmeta vê rêbazê bikin, heya ku em bigihin hemû daxwaz û mafên xwe yên ji ber ku Barzanî dibistanek bû ji bo hemû parçeyên Kurdistanê."

Sidîq Goran wiha got: "Barzaniyê Nemir serkirdeyekî netewî û niştimanperwer bû û ti cudahî nedikirin, xwe pêşmerge dihesiband û li kêleka Pêşmerge xebat dikir, jiyana wî jî ji ya Pêşmergeyan cuda nebû û hertim xizmeta gelê Kurd dikir. Ez bi xwe jî gelek caran pê re rûniştime, li Nexde û li Kerec û li Qesrê. Gelekî vekirî bû û herdem em şîret dikirin û digot li ser xebatê ji bo mafên gelê Kurd berdewam bin. Niha jî mezintirîn destkeft ji bo gelê Kurd bi dest hatiye peymana 11ê Adara 1970ê ye ku ez endamê rêxistina partiyê bûm û ez 23 salî bûm, lewma ew peyman baş tê bîra min."

Wî pêşmergeyê dêrîn wiha got: "Divê em hemû li ser vê rê û rêbaza pîroz berdewam bin û helbet destkeftên me ji berhema xebat û têkoşîna Barzaniyê Nemir in, lewra niha bêyî Serok Barzanî û vê rêbazê dê çareserkirina kêşeyan zehmet be, ji ber wê jî pêwîstiya me bi vê rêbazî her heye ji bo ku em hemû mafên gelê Kurd bidest bînin."

Ji aliyê xwe ve, pêşmergeyê herdu şoreşên Îlon û Gulanê Ebdulqadir Mihemed Mensûr ji malpera fermî ya Partiya Demokrata Kurdistanê KDP.info re ragihand: "Em hîn li ser rêbaza pîroz a Barzaniyê Nemir in. Erkê me ye ku em wek Barzanî ligel hejar, cotkar, karker û hemû çînên din bin. Divê em hertim pêbendî vê rêbazê bin, ji ber ku xebata Barzanî hertim ji bo bidestxistina mafên gelê Kurd bûye."

Wî pêşmergeyê dêrîn wiha got: "Destkeftên niha ji berhema têkoşîna Barzaniyê nemir in, ji ber wê jî erkê me ye ku em heman rê û rêbazê bişopînin da ku destkeftên zêdetir ji bo gelê Kurd bidest bixin, ji ber ku wê demê Qazî Mihemed ji Barzanîyê nemir re gotibû ezê bêm bidarvekirin û Ala Kurdisatanê da Barzaniyê Nemir. Barzaniyê Nemir yê hemû perçeyên Kurdistanê bû, ne tenê Başûrê Kurdistanê."

Ebdulqadir Mihemed Mensûr wiha got: "Em beşdarî hemû şoreşan bûne û şoreşên bi serokatiya Barzaniyê Nemir hemû ji bo bidestxistina mafên gelê Kurd bûne û piraniya destkeftan bi destên nemir Barzanî hatine bidestxistin."

***KDP.info***

# Başkan Barzani'den Halepçe mesajı

Başkan Barzani, Irak devletinin hala Kürdistan halkının haklarını silmek, inkar etmek istemesinin utanç verici olduğunu söyledi.

Başkan Mesud Barzani, Halepçe Katliamı'nın 36'ncı yıldönümü dolayısıyla Twitter hesabından bir mesaj paylaştı.

"Halepçe'ye kimyasal saldırı suçu, Kürdistan halkına karşı çıkan düşmanların zulmünün ve insanlık dışı zihniyetinin kanıtıdır." diyen Başkan Barzani, Halepçe trajedisinin üzerinden 36 yıl geçmesine rağmen Irak devletinin hala Kürt halkının haklarını silmek ve inkar etmek istemesinin utanç verici olduğunu vurguladı.



16 Mart 1988 yılında çoğu kadın ve çocuklardan oluşan 5 bini aşkın Kürt, Irak'ın devrik diktatörü Saddam Hüseyin'in emriyle Halepçe'ye savaş uçaklarıyla düzenlenen bombardımanda kullanılan kimyasal silahlarla şehit düştü.

**Halepçe Katliamı**

16 Mart 1988'de dönemin Irak hükümeti, Saddam Hüseyin'n talimatı ile Halepçe'ye kimyasal silahlarla saldırdı

En az 5 bin kişinin hayatını kaybettiği katliamda 10 binden fazla kişi de yaralandı. Yaralıların büyük çoğu kimyasal silahların etkisiyle kronik hastalıklara yakalandı. Tarihe "Halepçe Katliamı" olarak geçen bu insanlık dışı saldırı, Saddam Hüseyin liderliğindeki Baas rejiminin Güney Kürdistan'da Kürt halkına karşı 1986-1989 yılları arasında sistematik olarak sürdürdüğü Enfal Soykırımı'nın en acı ve en son etabıydı.

# 54 sal di ser Rêkeftina 11'ê Adarê re derbas dibin

Îro 54 saliya Rêkeftina 11ê Adara 1970ê ye ku di navbera serkirdeyê tevgera rizgarîxwaza gelê Kurdistanê Mistefa Barzanî û rejîma berê ya Iraqê de hatibû îmzekirin.

Rêkeftin ji pêşgotinekê û 22 xalan pêk dihat ku 15 ji wan eşkere û 7 jî nehênî bûn, xalên nehênî jî girêdayî diyarkirina herêma otonomî ya Kurdistanê, sererastkirina destûra Iraqê û çareserkirina navçeyên Kurdistanî Kerkûk, Xaneqîn û Şingalê bûn. Deqa Daxuyaniya Hevpar a Rêkeftinê:



**Yekem:** Naskirina zimanê kurdî li kêlek zimanê erebî li herêmên ku piraniya wan Kurd in.

**Duyem:** Kurd dê bi tevahî beşdarî rêveberiyê bibin, di nav artêşê de jî.

**Sêyem:** Perwerde û çanda kurdî bê pêşxistin.

**Çarem:** Li herêmên ku piraniya wan Kurd in, hemû karmend dê Kurd bin.

**Pêncem:** Kurd azad in ku rêxistinên xwendekar, ciwan, jin û mamosteyan ava bikin.

**Şeşem:** Budceyeke pêwîst ji bo avakirina Kurdistanê bê terxankirin.

**Heftem:** Mûçeyek ji bo malbatên şehîdan, hejar û penaberan tê diyarkirin.

**Heştem:** Kurd û Ereb dê vegerin cihên xwe yên berê.

**Nehem:** Çaksaziya çandiniyê dê bê kirin.

**Dehem:** Gelê Iraqê ji du neteweyên Kurd û Ereb pêk tê.

**Yazdehem:** Radyo û çekên giran dê radestî dewletê bên kirin.

**Duwazdem:** Yek ji cîgirên Serokkomarê Iraqê Kurd be.

**Sêzdehem:** Îdareya welat li gor vê rêkeftinê tê birêkxistin.

**Çardehem:** Budçeya herêmên ku piraniya wan Kurd lê dijîn, dê di yekîneyeke otonomî de bê birêkxistin.

**Pazdehem:** Gelê Kurd li gorî nifûsa xwe beşdarî desthilata yasadananê dibe.

Lê di demeke kin de piştî ji nû ve birêxistinkirinê, rejîma Beisê rêkeftin binpê kir, navê Kurd wek netewe di destûra demkî ya sala 1970'an de bicih nekir û perwerdeya Kurdî hiweşand. Herwiha cîbicîkirina heşt xalên rêkeftinê jî paşguh kir. Li Kerkûk, Xaneqîn û Şingalê pêvajoya erebkirinê berdewam kir. Feylî ji Bexdayê derxistin, nasnameya wan ji wan stand û bêyî Kerkûk, Xaneqîn û Şingalê herêmeke otonomî a Kurdistanê bi yekalî diyar kir. Di 6'ê Adara 1975'an de ji bo têkbirina Şoreşa Kurdistanê bi dewleta Îranê re peymanek îmze kir.

Gelek ji sîyasetmedar û çavdêrên siyasî vê rêkeftinê, wek destkefta duyem a piştî Peymana Sevrê dibînin ku tê de hikûmeta Iraqê mafên netewî yên gelê Kurd nas kir û vê rêkeftinê hêvî da civaka Kurdistanê.

# PWK: Ji bo bibîranîna jenosîda Helebçeyê em deqîqeyekê rêzê bigrin

PWKê bangkir û got; "Ji bo bibîranîna jenosîda Helebçeyê em deqîqeyekê rêzê bigrin..."

Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK), bi boneya Komkujîya Helepçeyê daxûyaniyek belav kir. PWK, di daxûyanîya xwe de komkujîyê şermezar kir û jibo rêzgirtinê hemû Kurdan re bang kir. Daxuyanî wihaye:

**"Ji bo bibîranîna jenosîda Helebçeyê em deqîqeyekê rêzê bigrin**




Ji bo şermezar kirina jenosîda Helebçeyê û bibîranîna 5000 şehîdên Helebçeyê yên ku ji alîyê rejîma Seddam Huseyînî ve hatin qetil kirin, li Başûrê Kurdistanê, di roja 16ê Adarê, bi saeta Hewlêrê di saet 11.00an de, gelê me li cîhên ku lê ne, radiwestin, rêzê digrin.

Em jî wek Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK), bangî kurd û kurdistanîyên her çar perçeyên Kurdistanê û li her cîhekî cîhanê ne dikin, da ku em roja 16ê Adarê bi saeta Hewlerê di saet 11.00an de, li cîhên ku em lê ne, ji bo bibîranîna 5000 hezar şehîdên Helebçeyê û hemû şehîdên Kurdistanê, em deqîqeyekê rawestin, rêzê bigrin."

Buroya Ragihandinê ya Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK)

570:1.QXD 17.03.2024 13:37 Page 13



# Ez û Seîd Yûsiv û Dostanîya Me

**Konê Reş, Qamişlo**

Di vê nivîsê de li dor dostaniya min bi hunermend Seîd Yûsiv re, bi min xweş e ku bi vê gotina Seydayê Cegerxwîn destpê bikim: Ger çi milet li wan camêran bi çavekî kêm jî dinere û rûmeta wan nabîne, lê gerek e, em qenciya dengbêj û stranbêjan ji bîr nekin ku zimanê Kurdî bi pêş ve birine û ji mirinê parastine; ji pencê mirinê û nav lepên zimanên bêgane bi mêranî parastine. Lê miletê Kurd, ji ber ku bi xwe nezan bû, nikarîbû rûmet û karên wan yên giranbiha nas bike

Cegerxwîn, Jînenîgariya min, rûpel 83.

Ez jî, dengê xwe tev dengê Seydayê Cegerxwîn dikim û dibêjim: Eger şêx û melayên me karîbûn bi dîwana Melayê Cizîrî, Mem û Zîna Ehmedê Xanî, helbestên Feqiyê Teyran, Nehcilenama Mele Xelîlê Sêrtî biparêzin, Stranbêj û dengbêjên me jî yên wek Şakiro, Kawis Axa, Karapêtê Xaço, Eyşe Şan, Mihemed Arif, Îssa Berwarî û yên mayî zimanê me ji talan û bişaftinê parastin. Rola wan di parastina zimanê Kurdî de zor mezin bû. Bêguman di pey wan re Seîd Yûsiv e, yekî sereke ye di nav hevalên xwe de wek Aramê Dîkran, Mehmûd Ezîz, Mihemed Şêxo, Seîd Gabarî û hevalên wan yên din. Wî roleke mezin di parastin û pêşketina strana Kurdî de lîstiye. Tevî qedexebûna zimanê Kurdî di wî heyamî de.

Ji berî 10 salan ve, ji ber giringiya kar û xebata Seîd Yûsiv di ber peyv û muzîka Kurdî de, min navê wî jî -Yê tekane sax- wek stêrekê, di nav her 33 navdarên Kurdan, yên mirî de, di pirtûka xwe ya bi navê “Ji Stêrên Welatê Qedexe” (Duhok 2013) de, nîşan kiriye, digel ku min wêneyê wî jî bi wêneyê wan re daxistiye ser bergê pirtûkê.

Dostaniya Min û Wî

Ji mêj ve min Seîd Yûsiv nas dikir, belê ji sala 1978an û vir de, min ew ji nêzîk ve nas dikir. Di sala 1979an de, piştî ku mala xwe ji Beyrût û Şamê zivirand Qamişloyê, dostaniya min pê re xweştir bû. Nexasim piştî ku di eynî salê de, wî şahiya zewaca min bi dengê xwe û têlên tembûra xwe xweş û geş kir û wî ev dostaniya me dirêj kir ta ku ew çûye ber dilovaniya Xwedê.

Di havîna 1980î de ji min re got Şivan Perwer hatiye Beyrûtê, ahengek ji kurdên Libnanê re lidarxistiye û nameyek ji min re şandiye, daxwaza dîtina min û tembûrekê dike. Ma tu bi min re nayê, em herin? Min bi erênî besiva wî da û di roja 25/6/1980an de, bi balafirê ji balafirgeha Qamişlo (ez û wî û kurê wî Zoro yê ku hingê 10 salî bû), me berê xwe da Şamê û ji Şamê em çûn Beyrûtê mala bavê wî. Şivan jî, li Beyrûtê di mêvandariya welatparêzê Kurd Ahmed Cimhûr de bû. Di encam de Şivan Perwer û çend kesên din pê re hatin mala bavê Seîd û me şevbuhêrkeke dirêj, ta derengî şevê li mala bavê wî derbas kir.

Di nav roj, meh û salan de, dostaniya min û wî şêrîntir dibû. Dema ku li Qamişlo ba, min ser jê qut nedikirin. Ji ber ku kesî wî li Qamişlo nebû; ne bira, ne pismam, ne pisêpismama û ne xaltîk, metik û xal. Min jî ev yek di ber çavên xwe re derbas dikir û rîzgirtinek mezin li gor huner û bêkesiya wî digirt û jê re digot (Xal), wî jî ji min re digot (Xwarzê).

Dema ku diya wî li Qamişlo çû ber dilovaniya Xwedê, ew li Beyrûtê bû, wek neferekî malbata wî, ez jî digel zarokên wî bi wacibê şîna diya wî (taziya) rabûm. Herweha piştî çend salan bavê wî jî mir, cardî ew ne hazir bû, li Ewropa/ Avustria bû, careke din ez bi wacibê şîna bavê wî rabûm. Xwedê heye; endamên Partiya Pêşverû li Qamişlo texsîr nekirin, di serê wan de mamoste Abdulhemîdê Derwêş.

Li dor çavpêketina xwe bi Mîr Dr. Kamîran Bedirxan re, ji min re digot: Di sala 1972an de, dema ku Mîr Dr. Kamîran Bedirxan û kebaniya xwe ji Parîsê hat Beyrûtê, ez jî ligel kurdên Beyrûtê di pêşwaziya wî de bûm. Di rûniştinekê de bi Mîr Kamîran re, li mala Necîmê Îbrahîmê Hesen yê ku wê hingê




serokê Komeleya Kurdên Libnanê bû, yekî ji Mîr re got: Mîrê min! Seîd Yûsiv stranên netewî nabêje. Mîr lê vegerand: Kurê Min! “Strana Girê Sîra bi Sîr e” ew jî Kurdistan e.

Digel ku mamoste Seîd Yûsiv dengbêj û mûzîkjen bû, wiha jî helbestvanekî stranan yê jîr û çeleng bû. Karîbû di kêliyekê de gotinên stranekê biafirîne. Û gelek caran ji min re digot "Kes nikare di warê jenîna tembûrê, afirandina helbestên stranî û awazan de li pêşiya min bide".

Ez dikarim bibêjim ku tev stranên wî, ji bilî yên folklorî ji hunandina wî ne. Ew kaniya helbestên stranî bû. Li gor nifşê xwe, rewşenbîrekî çak bû. Ji bilî zimanê Kurdî û Erebî hinekî bi zimanê Îngilîzî û Almanî jî zanîbû. Pirtûkxaneya wî ya malê bi baş pirtûkan dagirtî bû. Min pirtûkxane wek ya wî di mala hunermendan nedîtiye. Erê, piraniya stranên wî ji helbestên wî ne û dor 8 dîwanên helbestên wî hene. Ji dîwanên wî yên Çapbûyî: 1-Govenda Dilan 2-Rewşen 3-Sozdil û 4-Bedai Teelîm Alet Elbiziq (Bedewiyên Fêrkirina Amûra Bizqê).

Seîd Yûsiv; Mirovekî hezxwekirî û sebûr bû. Xwedî bîr û bawerî bû. Serê xwe ji kesî re neditewand. Aşiqê navê Barzaniyê nemir bû. Çendî dixwest careke din bi daxwaznameyeke fermî serdana herêma Kurdistana azad bike û strana “Kê dinya hejand.. Kê dolab gerand.. Ew Barzanî kak, rabû şûr kişand..” bibêje.. Lê sed mixabin ew xwesteka wî pêk nehat. Tevî ku gelek hunermendên Başûr xwe didan ber mesrefa wî ku here, lê wî qebûl nedikir. Divîbû wek mêvanê Hikûmeta Herêma Kurdistanê, here Kurdistana ku li serê stran gotine. Carekê hunermend Bilind Îbrahîm ji Duhokê hat serdana wî û li pêş min jê xwest ku serdana Kurdistanê bike û xwe da ber tev xerciya çûn û hatinê. Seîd Yûsiv qebûl nekir û jê re got; Spasiya te dikim, xerciya cûn û hatina min heye. Ez dixwazim bi rengekî fermî herim, wek mêvanê hikûmetê.

Dema ku li Qamişlo ba, an ji dûriyê bihata mala xwe li Qamişlo, zû bi zû ji mal dernediket ku ne bikar ba. Dost û nasên wî diçûn serdana wî. Deriyê mala wî vekirî bû. Xwedê heye; kebaniya wî Emîra Melûl jinek



mêvanhez, çavvekirî û merd bû. Bi beşişandin pêşwaziya mêvanê Seîd dikir. Her ku mêvanên wî ji cihên dûr dihatin, ez agahdar dikirim û dixwest bi wan re hazir bibim. Yê min jî, her ku mêvanekî minî xerîb bihata, min ew agahdar dikir û ez û mêvanê xwe diçûn serda wî. Kêfa wî dihat, kêfa mêvanê min jî bi naskirina wî dihat. Li min rehet dibû. Gelek caran taybetiyên xwe ji min re digotin. Carekê ji Beyrûtê telefon ji min re vekir û got; min bêriya te kiriye, ma tu nikare çend rojan bê Beyrûtê? Min bi erênî bersiva wî da û ez çûm. Carekê jî li



Qamişlo çûm serdana mala wî, min dît ku ew bi tenê ye, hin kaxet û maxet li ber destên wî ne, ji min re got: Xwarzê! Mêzeke evqas hunermendên Kurd ev stranên min gotine û lîsteyek bi nav wan stranan da destên min..

Ji stranên wî yên hezkirî

Rewşê rewşê Rewşenê, Eman Cîhan, Şikrayê, Ey Newroz, Kê dinya hejand, Çava kilke, Hêstirên min dibarin, Kurdistan yan neman, Gundîno hawar, Ax ji kerbê bav û bira, Kurdistan pirr şêrîn e, Sebra li ber vî dilî, Ez nikarim rabim ji va derda.

Jixwe bi vê strana xwe hiştiye ku navê Qamişlo li ser zardevê her neferekî be ji kurdên Rojava û hezkirin û dîtina Qamişlo bi Kurdistaniyan şêrîn kiriye:

Qamişlo bajarê evînê, cihê govend û civînê
Eger tu bixwe evîndarî, li wê dermanê birînê

Jiyana Seîd Yûsiv jiyanek hunerî bû, mişt kar û xebat bû. Wî 45 sal ji temenê xwe di ber peyv û muzîka Kurdî de xerc kir. Welatiyên wî jî, yên bîrewer û kesên ku bi nirxê muzîkê zanin, keda wî di ber çavên xwe re der-



bas kirin û bêtir ji 20 caran ew hatiye xelat kirine.

Sebaretî naznavê wî (Mîrê Bizqê) an Mîrê Tembûrê: Wek ku diyar e Mihemed Abdulkerîm, muzîkjenê Sûriyê, ewê bi bejna xwe kurt, ji bajarê Humsê bi navê Mîrê Bizqê/ Tembûrê naskirî bû, berî ku here ber dilovaniya Xwedê di hevpeyvînek xwe de gotibû "Heta Seîd Yûsiv hebê Bizqê/ Tembûrê namire". Û li gor tembiya wî, Bizqa wî ya taybet ji bo hunermend Seîd Yûsiv bê diyarî kirin. Ji wê hingê ve Seîd Yûsiv di medya Erebî û kurdî de bi navê Mîrê Bizqê hatiye naskirin.

Li gor ku di gelek rûniştinan de, Seîd Yûsiv ji min re digot "Hêvî û daxwazên min ku ez paymangeheke mûzîkê li bajarê Qamişlo vekim û xort û keçan fêrî muzîkê û hezkirina muzîkê bikim".

Koçkirina Dawî: Beyrût, Stenbol û Qamişlo

Di roja 26/2/2020an de dema ku min nûçeya koçkirina Seîd Yûsiv (Mîrê Bizqê), bihîst ku li Stenbolê mirîye, wek mirovê ku ji darekê ve bikeve! Nizanim çilo û çawa min ev gotin nivîsand û di rûpelê xwe de belav kir:

Seîd Yûsiv! Kê gotiye te koça dawî kiriye? Kê gotiye "Qamişlo, bajarê evînê", xwe ji hezkirina te dawişandiye? Kê gotiye "Rewşê Rewşê Rewşenê", bê guhdarî ma ye? Na na, bi koçkirina te re, bêrîkirina te, mezinbûna navê te bilindtir bûye. Navê Rewşen, Nesrîn, Canê, Ciwan, Sîpan û Hozan bêtir di kolanên Qamişloka te de têne bihîstin. Kurd ber bi dewletbûnê ve diçin. Nêzîk nedûr, wê Ala Rengîn di nav alên Netewên Yekbûyî de li New Yorkê bilind bibe û her emê bêjin; "Kurdistan yan neman, em kurd li ser ya xwe man". Raze bi xweşî! Tovê te çandiye, zindî ye. Bila her sibe çûk û çivîkên welatê me, li ser kêla ber serê te



û Cegerxwîn û Mihemed Şêxo deynin, ji me re sirûdên evînê bibêjin. Erê sirûdên evînê.

Berî ku bimre bi dor salekê, ew di Havîna 2019an de, ji Beyrûtê hat mala xwe a li Qamişlo, dor heyvekê li Qamişlo ma û careke din zivirî Bayrûtê. Ev hatina wî a dawî bû. Li gor ku jin û zarokên wî ji min re gotin; "Di roja 24/10/2019an de, me li Beyrûtê bihîst ku mamoste Hemîdê Derwêş cûye ber dilovaniya Xwedê. Berê jî Seîd nexweş bû, dema ku wî jî bihîst Hemîd miriye, êdî nema rabû ser xwe, nema meşiya, nexweşiya penceşêrê bêtir zor lê kir. Hez ji Hemîdê Derwêş dikir. Me ew şanî doktorên wî li Beyrûtê kir. Paşê me ew bir nexweşxaneyeke Stenbolê. Ta ku di roja 26/2/2020an de, canê xwe ji dest da û cû ber dilovaniya Xwedê.

Piştî ku nûçeya mirina wî belav bû, Hikumeta Herêma Kurdistanê, xwe da ber anîn û xerciya guhestina termê wî ji Stenbolê bo Qamişlo. Sibeha 1/3/2020, ez û birrek ji nivîskar û hunermendan çûn ser çemê Dicle (Sêmalka/ 100Km ji Qamişlo dûre), dergehê sînor di navbera Rojava û Başûr de, me pêşwaziya termê wî kir û anî Qamişlo, ew di goristana taxa Qidûr Beg de sipart axa sar û cemidî. Hêjayê gotinê ye, ji welatparêzên kurdan yên ku di vê goristanê de hatine veşartin: Mela Ehmedê Namî yê xwediyê sirûda Pêşkevin Em Serfiraz in Miletê Kurdî, Şêx Maaşûqê Xiznewî, Kemal Derwîş, Şêxmûs Ehmed, Siyamend Îbrahîm û gelekên din. Roja îro, gora wî jî li Qamişlo wek gora Cegerxwîn û Mihemed Şêxo bûye meqseda serdana welatparêzên Kurda.

Sed mixabin, ew pêşwaziya cemawerî ku ji Cegerxwîn re di sala 1984an de û ji Mihemed Şêxo re di sala 1989an de hat kirin, wek ku ji Seîd Yûsiv re pêdivî min nedît! Vê yekê dilê min şikenand!

Konê şiniya wî li Qamişlo, taxa Xerbî li ber dergehê mala wî hat danîn, Sê rojan dirêj kir. Sê rojan min û kurê wî Zoro pêşwaziya serdêrên şîna bavê wî kir. –Her du birayên wî yên din nikarîbûn amade bibin, Şahîn li Almaniya bû û Lawîn li Beyrûtê bû, bi tenê diya wî û xwîşkên wî hazir bûn- Ew serdêrên ku hatin şûn û şîna Seîd Yûsiv ji tev texlît ol û netewên Cizîrê bûn; ji Kurd, Ereb, Siryan, Ermen û Êzidî bûn.

Dawî dibêjim: Her wê muzîkjen Seîd Yûsiv, bimîne dost û ez ê li dengê wî, gotinên helbestên wî, perçeyên muzîkjeniya wî guhdarî bikim. Her wê bimîne kaniya helbest û awazan. Her wê bimîne Mîrê Tenbûrê û fexra muzîka Kurdî. Mirin pê nediket. Lê qeder jî kar û barê xwe dike. Belê wek ku kurdan gotiye: "Ga dimre çerm dimîne, mêr dimre nav dimîne".

570:1.QXD 17.03.2024 13:37 Page 14



## Peyama Serok Nêçîrvan Barzanî ya bi helkefta kîmyabaran kirina Helebçe

Di 36 saliya karesat û tawana hovane ya kîmyabarana Helebçeyê da, em bejna xwe li ber giyanê pakê zêdetirê ji 5 hezar şehîdên



Helebçeyê û tevaya şehîdên Kurdistanê ditewînin û em wan bi qedir û rûmet bi bîr tînin, silavên xwe ji malbat û kesûkarên wan û hemû qurbaniyan ra dişînin ku, hêşta ji ber şûnwar, paşmayî û êş û janên wê tawanê ve dinalin.

Kîmyabarana Helebçe xelekeke ji zincîreya tawan, jenosîd, enfal û bi zîndî binaxkirinê ku bi awayek gelek hovane li dijî gelê mezlûm yê aştîxwaz, jiyandost û mirovperwer yê Kurdistanê hatiye kirin, tenê tawana wan ew bû li welatê xwe daxwaza maf, jiyan, azadî û rûmeta welatê xwe kiribûn. Eger edalet hebûya, jenosîda Helebçeyê têra naskirina hemû mafên rewa yên gelê Kurdistanê dikir.

Bi vê minasebetê em tekez li ser wê yekê dikin ku divê Helebçe, xelkê wê û hemû qurbaniyên jenosîd, enfal û tawanên rejîma berê li Herêma Kurdistanê di hemû waran da werin qerebûkirin û di hemû waran de jî bi baştirîn awayî xizmet jê ra bê kirin. Ji bo vê yekê jî divê hikûmeta Iraqê hemû erk û berpirsiyariyên xwe û edaletê ji bo qurbaniyan bi cih bîne. Divê li ser asta cîhanê jî xebat bêne kirin da ku careke din tawan û jenosîdên bi vî rengî li tu devereke din dubare nebin.

Destkeft û kiyana siyasî û destûrî federalî ya Herêma Kurdistanê berhema xwîna şehîdan û qurbanîdana gelê Kurdistanê bi hemû pêkhateyên di nav de ye. Niha jî erkê me hemûyane bi yekrêzî û yekdengiyê biparêzîn û canê şehîdan û dilê malbat û kesûkarên wan şad bikin da ku bi hev ra ber bi pêşerojeke baştir, aram û parastî gavan biavêjin.

***Nêçîrvan Barzanî***
***Serokê Herêma Kurdistanê***

*16.03.2024*

## Bi biryara Serokwezîr Mesrûr Barzanî, Herîr dibe bajar

Qayimqamê Herîrê radigehîne, “Bi biryara Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi hejmara 451 Herîr bû bajark”. Qayimqamê Herîrê Şêrwan



Celal Beg îro (Sêşem, 12.03.2024) ji ajansa K24ê re ragehand, “Berî niha Herîr komelgeheke girêdayî bajarkê Şeqlaweyê bû, lê li dû biryara herêmî ya hejmar 423 û bi biryara Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî bi hejmar 451 li roja 31.01.2024ê û bi biryara Kargêriya Parêzgeha Hewlêrê bi hejmar 3162 li roja 10.03.2024ê, bi awayekî fermî biryar hat dan ku Herîr bibe bajark.

Qayimqamê Herîrê herwesa got, “46 gund girêdayî Herîrê bûn, niha jî ew 46 gund dê her girêdayî Herîrê bimînin, lê komelgeha Basirmeyê jî êdî girêdayî Herîrê ye ku ew jî 54 gundan vedigire, yanî niha bi tevahî Herîrê 100 gund hene”.

Şêrwan Celal Beg amaje jî da, “Niha navê Herîrê ji komelgehê bo bajarkî hat guhertin, her ji ber wê yekê daxwaziyên me dê zêdetir bibin”. Navbirî di derheqa kar û pilanên bajarkê Herîrê de jî got, “Niha pêdivîtiya me bi birêveberiyeke tandirustiyê, birêveberiyeke perwerdeyê û fermangeheke tapoyê heye”.

# Serok Barzanî: Helebce belgeya eqliyeta nemirovane ya neyarên gelê Kurdistanê ye



Serok Barzanî got, “Tawana kîmyabarankirina Helebceyê belgeya zilmkarî û eqliyeta nemirovane ya neyarên gelê Kurdistanê ye.” Serok Barzanî ji bo salvegera 36an a Komkujiya Helebceyê bi rêya hesabê xwe yê Xê peyamek belav kir.

**“Dewleta Îraqê dixwaze mafên gelê Kurdistanê înkar bike”**

Serok Barzanî bi peyama xwe de bal kişand ser helwesta dewleta Îraqê û got: “Tawana kîmyabarankirina Helebceyê belgeya zilmkarî û eqliyeta nemirovane ya neyarên gelê Kurdistanê ye.

Piştî ku 36 sal di ser kareseta Helebceyê derbas bûne, cihê şermezariyê ye ku heta niha jî dewleta Îraqê hez dike mafên gelê Kurdistanê înkar bike û ji holê rake.”

**Komkujiya Helebceyê**

Di ser Komkujiya Helebceyê re 36 sal derbas bûn.

16ê Adara 1988an bi fermana serokkomarê berê yê Îraqê Sedam Husên ji asman bombeyên kîmyewî bi ser Helebceyê de hatin berdan. Di vê komkujiya giran de herî kêm 5 hezar kesan canê xwe ji dest da, zêdetirî 10 hezar kesan jî birîndar bûn.

Îro salvegera 36an Komkujiya Helebceyê ye ku di dîroka Kurdan de bûye rojeke reşgirêdanê. Şopên Komkujiya Helebceyê hîn jî wekî roja yekem di dilan de nû ne.

Komkujiya Helebceyê piştî Hîroşîma û Nagasakiyê wekî êrişa kîmyewî ya herî mezin tê pênasekirin.

**Herî kêm 5 hezar kes şehîd ketin**

16ê Adara 1988an bi fermana dîktatorê Îraqê Sedam Husên, zêdetirî 5 hezar kes ku piraniya wan jin û zarok bûn, bi çekên kîmyewî hatin şehîdkirin.

Di kîmyabarana Helebceyê de bi firokeyên şer hatin bikaranîn.

Ev êrişa ku bi navê “Komkujiya Helebceyê” ket dîrokê.

Ev êriş qonaxa herî biêş û dawî ya Komkujiya Enfalê bû ku Rejîma Beasê ya bi serokatiya Sedam Husên di navbera salên 1986-1989an de bi awayekî sîstematîk li Başûrê Kurdistanê pêk anî.

Komkujiyan Enfalê 12ê Adara 1986an dest pê kir û 7ê Hezîrana 1989an bi dawî bû.

**182 hezar Kurd hatin qetilkirin**

Di vê silsîleya komkujiyan de 182 hezar Kurd hatin qetilkirin, 4500 gund û 30 bajarok hatin kavilkirin, mizgeft, dêr û îbadetxane hatin wêrankirin.

Ji bo ku çekên kîmyewî bandoreke zêde bihêlin, hêza asmanî ya Îraqê destpêkê bi çekên konvansiyonel bombebaran kir û camên malan şikandin û piştre jî bombeyên kîmyewî avêtin.

Sibeha 16ê Adara 1988an 8 firokeyên MiG-23 yên hêza asmanî ya Îraqê 5 demjimêran bombeyên gazê yên jehrî bi ser Helebceyê de barandin ku nifûsa 40 hezar bû.

**Gaza bi "bêhna sêvan" bajar dorpêç kir**

Dema êrişa duyem dest pê kir, bêhneke xurt belav bû. Kesên ku bûne şahidê wan kêliyan dibêjin ku gaza bi “bêhna sêvan” di bombeyên ku bi ser bajêr de ketine, di nava çend deqeyan de li nav bajêr belav bû.

Şêniyên Helebceyê yên ku bêhna gazên weke xerdel, sarîn û VX yên di bombebaranê de hatine bikaranîn çû wan, yek bi yek ketin erdê. Di komkujiyê de zêdetirî 5 hezar kes ku piraniya wan jin û zarok in şehîd ketin.

Zêdetirî 10 hezar kesan jî birîndar bûn. Hin çavkanî diyar dikin ku 6 hezar û 357 kes jehrî bûne û 14 hezar û 765 kes jî bi giranî birîndar bûne. Li gorî rapora Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanî (WHO), ev êrişa kîmyewî heta niha bûye sedema mirina zêdetirî 43 hezar û 753 kesan û seqetbûna zêdetirî 61 hezar kesan.

Tîma Pizîşkên Sînornenas ku di destpêkê de gihîştin cihê bûyerê, bikaranîna gaza xerdelê piştrast kir. Vê tîma bijîşkên Belçîkayî û Holendayî ragihand ku dibe ku di nav jehrên ku hatine bikaranîn de siyanur hebe. Hin birîndarên komkujiyê bi nexweşiyên domdar re rû bi rû mane.

**"Soz nehatin bicihanîn"**

Sedam Husênê ku sala 2003yan ji desthilatdariyê hat xistin, di çarçoveya Komkujiya Enfalê de, ji ber kuştina 180 hezar kesî hat darizandin.

Sedam sala 2006an de bi cezaya îdamê ya ji ber Komkujiya Duceylê hat darvekirin.

Piştî mirina wî, di dadgeha ku bi sûcê komkujiya li dijî Kurdan dihat darizandin de, tawanbar hat dîtin.

Pismamê Sedam Husên, Elî Hesen El Mecîdê bi nasnavê "Elî Kîmyewî" sala 2010an ji ber fermana êrişên bi gaza jehrî ku di nav de Komkujiya Helebceyê jî heye, hat bidarvekirin.

Dadgeha Cezayên Giran a Îraqê 1ê Adara 2010an Komkujiya Helebceyê wekî jenosîd nas kir.

Tevî ku ev biryar ji aliyê Hikûmeta Herêma Kurdistanê ve bi kêfxweşî hat pêşwazîkirin jî Hikûmeta Îraqê piştgiriya pêwîst neda malbatên Helebceyê û soz nehatin bicihanîn. Hikûmeta Herêma Kurdistanê Adara 2014an biryar da ku Helebceya ku li ser Silêmaniyê ye, bibe parêzgeh.

# Sîyasetmedarekî Iraqî: Serok Barzanî û Mesrûr Barzanî rêyê li şerê navxweyî yê Îraqê digirin

Siyasetmedarekî Sune yê Îraqê amajeyê dide, “Dadgeha Federalî dadgeheke Îranî ye û tevaya pêkhatan kirine armanc”, ecêbamana xwe jî li bernaberî helwesta Serokkomarê Îraqê ya li beranberî wan biryarên Dadgeha Federalî diyar dike, herwesa dibêje, “Hikmeta Serok Barzanî û Serokwezîr Mesrûr Barzanî rêyê li serhildana şerê navxweyî yê Îraqê digire”. Siyasetmedarê Sune yê Îraqê Mîsal Alûsî îro (Înî, 15.03.2024) taybet ji K24ê re ragehand, “Dadgeha Federalî dadgeheke destûrî nîne, berî destûrî hatiye damezrandin û Herêma Kurdistanê tenê nekiriye armanc, belkî tevaya pêkhatan kirine armanc û armanca wê ya serekî lêdana sîstema destûrî û demokrasî ye ku Îraq li ser wan hatiye avakirin”. Mîsal Alûsî amaje jî da, “Serokkomarê Îraqê li beranberî biryarên Dadgeha Federalî bê helwest e, ji ber ku hindek ji wan biryaran nedestûrî ne û pêdivî ye Serokwezîrê Îraqê desttêwerdanê tê de bike”. Alûsî ecêbmana xwe jî li beranberî Serokkomarê Îraqê Letîf Reşîd diyar kir got, “Li beranberî wan biryarên Dadgeha Federalî herwekî ku Serokkomar nîne û çi gotin nînin, di demekê de ku hind e ew biryar Îraqê bixin nav serî”. Navbirî eşkere jî kir ku, ew bi çi awayan biryarên Dadgeha Federalî qebûl nakin, eger ew dadgeh bixwaze Îraqê ber bi sîstema navendî ve bibe, di demekê de ku destûrê Îraqê federalî ye. Wî siyasetmedarî tekez jî kir, “Destûrê Îraqê maf daye tevaya pêkhatan ku tevlî piroseya siyasî bibin, eger Dadgeha Federalî rêyê li wî mafî bigire, yanî Îraq ne demokratî û destûrî ye û ber bi diktatoriyê ve diçe”. Alûsî herwesa ragehand, “Eger hikmeta Serok Barzanî û Serokwezîr Mesrûr Barzanî û Serkirdetiya Siyasî ya Herêma Kurdistanê nebe, Kurd dikarin şerî bikin û bergiriyê ji mafên xwe bikin”. Navbirî tekez jî kir, “Hikmeta Serok Barzanî û Serokwezîr Mesrûr Barzanî rêyê li serhildana şerê navxweyî yê Îraqê digire û bi wê hikmetê bi hezaran aware û penaber li Herêma Kurdistanê parastine û diparêzin û meremа wan ew e pêkvejiyanê berdewam bikin. Dadgeha Federalî ku dadgeheke Îranî ye li dijî wê hikmet û zanîna Herêma Kurdistanê û serkirdetiya wê ya siyasî ye”.



Heta niha Dadgeha Federalî ya Îraqê hejmareke biryaran li dijî Herêma Kurdistanê derxistiye, dawî biryar ên roja 21.02.2024ê bûn, ji bo yekalîkirina wan skalayan ên ku li dijî mûçeyên fermanber û mûçexurên Herêma Kurdistanê û qanûna girêdayî hilbijartinên Perlemana Kurdistanê hatibûn tomarkirin.

570:1.QXD 17.03.2024 13:37 Page 15



## Nêçîrvan Barzanî: Rêkeftina 11ê Adarê berhema têkoşîn û qurbanîdana gelê Kurdistanê bû

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî di salvegera rêkeftina 11ê Adarê de dibêje, “Bila em



vê bîranên li Herêma Kurdistanê bikin derfeta hevtêfihîştina hevbes a aliyên siyasî” û li Iraqê jî “Em pend û wane ji paşeroja biêş a welat werbigirin û destûrê cîbicî bikin.” Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî di salvegera rêkeftina 11ê Adarê de dibêje, “Bila em vê bîranên li Herêma Kurdistanê bikin derfeta hevtêfihîştina hevbes a aliyên siyasî” û li Iraqê jî “Em pend û wane ji paşeroja biêş a welat werbigirin û destûrê cîbicî bikin.”

Deqa peyama Serokê Herêma Kurdistanê: Em îro 54 saliya rêkeftina 11ê Adara 1970ê ku, di navbera hikûmeta Iraqê ya wê demê û Şoreşa Mezin ya Îlonê bi serokatiya Barzanî yê nemir da îmza kiribû, bi bîr tînin. Ev Rêkeftinname werçerxanek çarenivîsaz û yekem belgeya fermî bû di dîroka nûjen da. Ew berhema tekoşîn û qurbanîdana gelê Kurdistanê bû ku, hikûmeta Iraqê neçar kir hindek mafên rewa yên gelê Kurdistanê nas bike û bû bingehê hemû destkeftên gelê Kurdistanê yên paşerojê. Bi vê minasebetê em dîroka pir bi êş û jan ya dewleta Iraqê bi bîra hemûyan tînin ku, lojîka hêz, fikir û siyaseta înkarkirina mafên gelê Kurdistanê û pêkhateyên Iraqê bi giştî çi ziyan gihandiye welat? Poşmanbûna hikûmeta hîngê ya Iraqê ji rêkeftinê, şer, wêranî, karesat û nearamî ji bo Iraq û gelên wê bi berdewamî bi xwe ra aniye ku encamên wê heta îro jî berdewam in. Bila em li Herêma Kurdistanê vê bîranînê bikin derfeta lihevtêgihîştina hevbeş a aliyên siyasî ji bo derbaskirina pirsgirêk û nakokiyan û bi hev ra rûbirûyê aloziyan bibin û destkeftan, mafên destûrî û statuya federaliya Herêma Kurdistanê biparêzin. Li Iraqê jî divê ders û îbretan ji dîroka rabirdû a bi êş a welat werbigirin, destûrê bicîh bikin, sîstema federalî û mafên hemû gelan û pêkhateyên Iraqê biparêzin û bi nêrîneke hevbeş ber bi paşerojê gavan pavêjin.

Silav li bîranîna rêkeftinnameya 11ê Adarê û silav li giyanê şehîdan.

***Nêçîrvan Barzanî***
***Serokê Herêma Kurdistanê***

## Ji Pentagonê di derbarê sîstema berevaniya asmanî ji Herêma Kurdistanê re daxûyanî da

Wezareta Berevaniyê ya Amerîkayê (Pentagon) di bersiva pirseke peyamnêrê K24ê de ragihand, “Em




daxwaz ji Kongressê dikin ku bûdceya sîstema berevaniya asmanî ji Herêma Kurdistanê re pesend bike. Berdevkê Pentagonê Pat Ryder di konferanseke rojnamevanî de bersiva pirsa peyamêrê K24ê da û ragihand, “Em li bendê ne ku bûdceya sala 2024an were qebûlkirin.” Berdevkê Pentagonê got: “Em daxwazê ji Kongreyssê dikin ku budceyê pesend bike û dema ku ew hat pesendkirin, emê hûrgiliyên zêdetir gotûbêj bikin.” Pêştir general generalê berê yê artêşa Amerîkayê Ernest Oderno jî gotibû, divê Washington ewlehiya Herêma Kurdistanê dabîn bike, ji ber wê jî ew ji sedî sed bi şandina sîstemên berevaniya asmanî ji Herêma Kurdistanê re ye. General Ernest Oderno got, Herêma Kurdistanê hevpareke mezin a Amerîkayê ye û niha pêwîstiya wan bi sîstema berevaniya asmanî heye, ji ber ku ew di bin gefa Îran û hevpeymanên wê de ye. Di derbarê şandina sîstemên berevaniya asmanî ji Amerîkayê bo Herêma Kurdistanê de, General Ernest Oderno got ku Pentagon dikare bi du awayan sîstemên berevaniya asmanî li Herêma Kurdistanê bicîh bike, rêya yekem perwerdekirina hêzên Pêşmerge ye ji bo bikaranîna sîstemê û rêya duyem jî ew e ku Amerîka bi xwe çavdêriya bikaranîna sîstemê li navçeyê bike.

# Nêçîrvan Barzanî: Eger edalet hebûya Helebce bes bû

Nêçîrvan Barzanî got, “Eger edalet hebûya, Komkujiya Helebceyê têra naskirina hemû mafên rewa yên gelê Kurdistanê dikir.” Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî ji bo salvegera 36an a Komkujiya Helebceyê peyamek belav kir.

**“Em bejna xwe li ber giyanê pak ê şehîdên Kurdistanê ditewînin”**

Serokê Herêma Kurdistanê di peyama xwe de wiha got:

“Di 36 saliya karesat û tawana hovane ya kîmyabarana Helebceyê de, em bejna xwe li ber giyanê pak ê zêdetir ji 5 hezar şehîdên Helebceyê û hemû şehîdên Kurdistanê ditewînin.

Em wan bi qedir û rûmet bi bîr tînin, silavên xwe ji malbat û kesûkarên wan û hemû qurbaniyan re dişînin ku em heta niha jî ji ber şûn, bermayî û êş û janên wê tawanê dinalin.

Kîmyabarana Helebceyê xelekeke ji zincîreya tawan, komkujî, enfal û bisaxî binaxkirinê ye ku bi awayekî gelekî hovane li dijî gelê mezlûm yê aştîxwaz, jiyandost û mirovperwer ê Kurdistanê hatiye kirin.

Tenê tawana wan ew bû ku wan li welatê xwe daxwaza maf, jiyan, azadî û rûmeta welatê xwe kiribû.

**“Eger edalet hebûya...”**

Eger edalet hebûya, Komkujiya Helebceyê têra naskirina hemû mafên rewa yên gelê Kurdistanê dikir.

Bi vê minasebetê em tekeziyê li ser wê yekê dikin ku divê Helebce, xelkê wê û hemû qurbaniyên komkujî, enfal û tawanên rejîma berê yên li Herêma Kurdistanê di hemû waran da werin qerebûkirin (tezmînat) û di hemû waran de jî bi awayê herî baş xizmet jê re bê kirin.

**“Divê Îraq berpirsiyariyên xwe bi cih bîne”**

Ji bo vê yekê jî divê hikûmeta Îraqê hemû erk û berpirsiyariyên xwe û herwiha edaletê ji bo qurbaniyan bi cih bîne. Divê li seranserê cîhanê jî xebat bên kirin da ku careke din tawan û komkujiyên bi vî rengî li tu devera din ducare nebin.

Destkeft û statuya siyasî, destûrî û federalî ya Herêma Kurdistanê berhema xwîna şehîdan û qurbanîdana gelê Kurdistanê û hemû pêkhateyên di nav de ye.

Niha jî erkê me hemûyan e ku em bi bi yekrêzî û yekdengiyê wê biparêzîn û canê şehîdan û dilê malbat û kesûkarên wan şad bikin da ku em bi hev re ber bi paşerojeke baştir, aram û parastî gavan biavêjin.”

**Komkujiya Helebceyê**

Di ser Komkujiya Helebceyê re 36 sal derbas bûn.

16ê Adara 1988an bi fermana serokkomarê berê yê Îraqê Sedam Husên ji asman bombeyên kîmyewî bi ser Helebceyê de hatin berdan.

Di vê komkujiya giran de herî kêm 5 hezar kesan canê xwe ji dest da, zêdetirî 10 hezar kesan jî birîn-



dar bûn. Îro salvegera 36an Komkujiya Helebceyê ye ku di dîroka Kurdan de bûye rojeke reşgirêdanê.

Şopên Komkujiya Helebceyê hîn jî wekî roja yekem di dilan de nû ne.

Komkujiya Helebceyê piştî Hîroşîma û Nagasakiyê wekî êrişa kîmyewî ya herî mezin tê pênasekirin.

**Herî kêm 5 hezar kes şehîd ketin**

16ê Adara 1988an bi fermana dîktatorê Îraqê Sedam Husên, zêdetirî 5 hezar kes ku piraniya wan jin û zarok bûn, bi çekên kîmyewî hatin şehîdkirin.

Di kîmyabarana Helebceyê de bi firokeyên şer hatin bikaranîn.

Ev êrişa ku bi navê “Komkujiya Helebceyê” ket dîrokê.

Ev êriş qonaxa herî biêş û dawî ya Komkujiya Enfalê bû ku Rejîma Beasê ya bi serokatiya Sedam Husên di navbera salên 1986-1989an de bi awayekî sîstematîk li Başûrê Kurdistanê pêk anî.

Komkujiyan Enfalê 12ê Adara 1986an dest pê kir û 7ê Hezîrana 1989an bi dawî bû.

**182 hezar Kurd hatin qetilkirin**

Di vê silsîleya komkujiyan de 182 hezar Kurd hatin qetilkirin, 4500 gund û 30 bajarok hatin kavilkirin, mizgeft, dêr û îbadetxane hatin wêrankirin.

Ji bo ku çekên kîmyewî bandoreke zêde bihêlin, hêza asmanî ya Îraqê destpêkê bi çekên konvansiyonel bombebaran kir û camên malan şikandin û piştre jî bombeyên kîmyewî avêtin.

Sibeha 16ê Adara 1988an 8 firokeyên MiG-23 yên hêza asmanî ya Îraqê 5 demjimêran bombeyên gazê yên jehrî bi ser Helebceyê de barandin ku nifûsa 40 hezar bû.

**Gaza bi "bêhna sêvan" bajar dorpêç kir**

Dema êrişa duyem dest pê kir, bêhneke xurt belav bû.

Kesên ku bûne şahidê wan kêliyan dibêjin ku gaza bi “bêhna sêvan” di bombeyên ku bi ser bajêr de ketine, di nava çend deqeyan de li nav bajêr belav bû.

Şêniyên Helebceyê yên ku bêhna gazên weke xerdel, sarîn û VX yên di bombebaranê de hatine bikaranîn çû wan, yek bi yek ketin erdê.

Di komkujiyê de zêdetirî 5 hezar kes ku piraniya wan jin û zarok in şehîd ketin.

Zêdetirî 10 hezar kesan jî birîndar bûn. Hin çavkanî diyar dikin ku 6 hezar û 357 kes jehrî bûne û 14 hezar û 765 kes jî bi giranî birîndar bûne.

Li gorî rapora Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanî (WHO), ev êrişa kîmyewî heta niha bûye sedema mirina zêdetirî 43 hezar û 753 kesan û seqetbûna zêdetirî 61 hezar kesan.

Tîma Pizîşkên Sînornenas ku di destpêkê de gihîştin cihê bûyerê, bikaranîna gaza xerdelê piştrast kir.

Vê tîma bijîşkên Belçîkayî û Holendayî ragihand ku dibe ku di nav jehrên ku hatine bikaranîn de siyanur hebe.

Hin birîndarên komkujiyê bi nexweşiyên domdar re rû bi rû mane.

**"Soz nehatin bicihanîn"**

Sedam Husênê ku sala 2003yan ji desthilatdariyê hat xistin, di çarçoveya Komkujiya Enfalê de, ji ber kuştina 180 hezar kesî hat darizandin.

Sedam sala 2006an de bi cezaya îdamê ya ji ber Komkujiya Duceylê hat darvekirin.

Piştî mirina wî, di dadgeha ku bi sûcê komkujiya li dijî Kurdan dihat darizandin de, tawanbar hat dîtin.

Pismamê Sedam Husên, Elî Hesen El Mecîdê bi nasnavê "Elî Kîmyewî" sala 2010an ji ber fermana êrişên bi gaza jehrî ku di nav de Komkujiya Helebceyê jî heye, hat bidarvekirin.

Dadgeha Cezayên Giran a Îraqê 1ê Adara 2010an Komkujiya Helebceyê wekî jenosîd nas kir.

Tevî ku ev biryar ji aliyê Hikûmeta Herêma Kurdistanê ve bi kêfxweşî hat pêşwazîkirin jî Hikûmeta Îraqê piştgiriya pêwîst neda malbatên Helebceyê û soz nehatin bicihanîn.

Hikûmeta Herêma Kurdistanê Adara 2014an biryar da ku Helebceya ku li ser Silêmaniyê ye, bibe parêzgeh.

Hikûmeta Îraqê jî de biryara ku Helebce bibe parêzgeh pejirand.

## Serokwezîr Mesrûr Barzanî pêşwaziya Balyozê Brîtanyayê li Îraqê dike

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê pêşwaziya Balyozê Brîtanyayê li Îraqê dike.



Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê îro (Çarşem, 13.03.2024) pêşwaziya Balyozê Brîtanyayê li Îraqê Stephen Hitchen kir. Li dû ragehandina Hikûmeta Herêma Kurdistanê, di wê hevdîtinê de danûstandin li ser pêşxistina peywendiyên dualî û rewşa giştî û dawî pêşhatên Îraq û deverê û giringiya çarekirina arêşeyên Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Federalî li ser bingeha destûrî û lihevkirinan hatin kirin.

Wekî amaje pê hatiye dan, her du alî li ser giringiya parastina ewlehî û seqamgiriya Herêma Kurdistanê û rêzgirtina li qewareya federalî û destûrî ya Herêma Kurdistanî hevnerîn bûn.

Di wê ragehandinê de hatiye, Balyozê Brîtanyayê tekez li ser wê yekê kiriye ku hevpariya wan bi Herêma Kurdistanê re cihê giringî û pûtedana me ye û dê li ser hevahengiya tevalî bi Hikûmeta Herêma Kurdistanê re berdewam bin. Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî tekez kir ku Herêma Kurdistanê berevaniyê ji mafên xwe yên destûrî dike û li bin çi givaştinan destan ji mafên xwe bernade. Piştevanîkirina çaksaziyên Wezareta Pêşmerge û giringiya parastina mafên pêkhatên Kurdistanê û pêdivîtiya pêkanîna Civata Federalî jî mijarên çend tewerên din ên wê civînê bûn.

## HAK-PAR: EM ŞEHÎDÊN KOMKUJIYA HELEBÇÊ BI RÊZDARÎ BI BÎRTÎNIN

HAK-PAR; "Ev komkujî encama bêdewlet û bêstatû hîştina gelê Kurd ji aliyê dewletên




emperyalîst a piştî Şerê Cîhanê Yekem bû..."

Partiya Maf û Azadîyê (HAK-PAR), bi boneya salvegera Komkujîya Helepçeyê daxûyanîyek bibîranî. Daxûyanîya HAK-PARê wihaye: "Di 16'ê Adara 1988'an de, li ber çavên hemû cîhanê, rejîma Seddam a kolonyalîst û nîjadperest bi bombeyên kîmyewî yên ku tê de gaza Xerdel û Sarîn a bi bêhna sêvê ya kujer, bajarê Helebce yê Başûrê Kurdistanê bombebaran kir. 7 hezar Kurdên ku tenê sûcê wan 'Kurdbûn' bû, ji ber gazên kimyewî jehrdarî bûn jiyana xwe ji dest dan.

Ev jenosîd beşek ji Operasyona Enfalê bû ku ji aliyê rejîma Baas a kolonyalîst ve ji bo bi giştî tunekirina kurdan dest pê kir û bû sedemê jiyana derdora 200 hezar kurdan.

Ev komkujî encama bêdewlet û bêstatû hîştina gelê Kurd ji aliyê dewletên emperyalîst a piştî Şerê Cîhanê Yekem bû.

Qêrîna kesên ku di vê qirkirinê de şehîd bûne ji hemû cîhanê re careke din ragihand ku gelê Kurd hebûna xwe di bin tehdîdê de be jî, dest ji azadiya xwe bernade.

36 sal in ku her roja 16ê Adarê ji birîna Helebçeya ku 'bêhna sêvan jê tê' xwîn diherike û tevahiya Kurdistanê xwîn digirî... Şîna Helebçeyê, miletê Kurd bi hişmendiya netewî zindîtir dike ji bo ku azadî çarenûsa xwe bi destê xwe pêk bîne. Weke HAK-PAR em kesên ku di operasyonên Helebçe û Enfalê de jiyana xwe ji dest dane bi rêzdarî bi bîr tînin. Em careke din barbariya kolonyalîst şermezar dikin."

# Serok Barzanî: Dr. Cercîs Hesen jiyê xwe di Pêşmergetî û xebata gelê xwe de derbaz kir

Serok Barzanî ji bo koça dawiyê ya Dr. Cercîs Hesen peyameke serexweşiyê belav dike.

Serok Barzanî îro (Înî, 15.03.2024) ji bo koça dawiyê ya Dr. Cercîs Hesen peyameke serexweşiyê belav kir ku tê de hatiye, "Xudêjêrazî Dr. Cercîs Hesen jiyê xwe bi awayekî merdane di Pêşmergetî û xebata gelê xwe de derbaz kir û mînaka wefadarî û dilsoziyê bû".

Herwesa di peyama Serok Barzanî de hatiye, "Em serexweşiyê li tev heval û hevsenger û dost û nas û malbat û kesûkarên Xudêjêrazî Dr. Cercîs Hesen dikin û em hevparên xema wan in".

Li dawiyê jî Serok Barzanî lava ji bo Xudêjêrazî Dr. Cercîs Hesen û tev aliyan kirine û gotiye, "Em ji Xudayê mezin dixwazin canê Xudêjêrazî Dr. Cercîs Hesen bi behişta berîn şa bike û sebir û hedarê bi tev aliyan bide.

Ev jî deqê peyama Serok Barzanî ye:

**"Bi navê Xudayê mezin û dilovan**

Bi mixabiniyeke zêde ve xeberê koça dawiyê ya têkoşer û xebatkerê gelê me û endamê berê yê Mekteba Siyasî û Komîteya Navendî ya PDKyê Dr. Cercîs



Hesen gehişt min.

Xudêjêrazî Dr. Cercîs Hesen jiyê xwe bi awayekî merdane di Pêşmergetî û xebata gelê xwe de derbaz kir û mînaka wefadarî û dilsoziyê bû. Em serexweşiyê li tev heval û hevsenger û dost û nas û malbat û kesûkarên Xudêjêrazî Dr. Cercîs Hesen dikin û em hevparên xema wan in.


Em ji Xudayê mezin dixwazin canê Xudêjêrazî Dr. Cercîs Hesen bi behişta berîn şa bike û sebir û hedarê bi tev aliyan bide.

Îna lîlah we îna îleyhî racîon"

***Mesûd Barzanî***

*15ê Adara 2024ê*

## Fraksiyona PDKê 17 daxwazan pêşkêşî Serokwezîrê Iraqê dike



Serokwezîrê Iraqê pêşwazî li serok û endamên Fraksiyona Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) li Parlamentoya Iraqê kir û di civînê de mijarên têkildarî Hikûmeta Federal û Hikûmeta Herêma Kurdistanê hatin gotûbêjkirin.

Fraksiyona PDKê di daxuyaniyekê de ragihand, Serokwezîrê Iraqê Mihemed Şiya Sûdanî pêşwazî li serok û endamên Fraksiyona PDKê kir û gotûbêj li ser çend mijarên giring hatin kirin, ji wan jî:

**Yekem:** Peywendiyên di navbera Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Federal de bi giştî û tekezî li ser pabendbûna wan li ser rêkeftinên ku di vê derbarê de hatine kirin, ku girêdayî berjewendiyên Herêma Kurdistanê ne.

**Duyem:** Pirsa bûdce û mûçeyên Hikûmeta Herêma Kurdistanê û biryarên Dadgeha Federalî derbarê mûçeyên fermanberên Hikûmeta Herêma Kurdistanê ku ne hevtayê destûrê ne û herwiha pişka Herêma Kurdistanê di bûdceya giştî de.

**Sêyem:** Tekezîkirina li ser post û mafên Herêma Kurdistanê di postên leşkerî û ewlehî de, ji wan dezgehên ewlekariya niştimanî, istixbarat, dijeteror, cîgirên wezaret û desteyên serbixwe.

**Çarem:** Tekezî li ser pesendkirina yasayên girîng ên di rojeva kabîneya Sûdanî de û şandina wan ji bo Parlamentoya Iraqê, ji wan jî yasaya federalî û Encûmena Federal.

**Pêncem:** Berçavgirtina pişka Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) di Encûmena Nûneran de, wek mezintirîn fraksiyona Kurdistanî.

**Şeşem:** Mafên Herêma Kurdistanê di derman û çareseriyan de, yên taybet bi Wezareta Tendirustiya Herêma Kurdistanê ve.

**Heftem:** Zêdekirina hejmara kesên ku çavdêriyê di tora civakî li Herêma Kurdistanê de dikin û herwiha qerebûkirina kesên ku di bombebarankirina sînoran de jiyana xwe jidest dane.

**Heştem:** Hêsankirinên bo kompanyayên veberhênanê yên li Herêma Kurdistanê û reftarkirina ligel wan weke kompaniyên din ên iraqî.

**Nehem:** Xerckirina qerebûyên welatiyên Herêma Kurdistanê yên têkildarî daxwazên milkiyetê.

**Dehem:** Dana semad, pêdiviyên çandiniyê û alavên çandiniyê bi Herêma Kurdistanê, wek cotkarên din ên Iraqê.

**Yazdehem:** Vekirina şaxên bankên çandinî û pîşesazî li Herêma Kurdistanê.

**Duwazdehem:** Teqezkirina li Rêkeftina Şingalê.

**Sêzdehem:** Naskirina zanîngeh û peymangehên din ên Herêma Kurdistanê û Borda Kurdistanê ya ser bi Wezareta Xwendina Bilind û Lêkolînên Zanistî ve.

**Çardehem:** Bileznekirina derbarê biryarên girtina ofîsên nûneratiyên Wezareta Perwerdeya Federal li parêzgehên din ên Iraqê de.

**Pazdehem:** Teqezî li ser yeksankirina tîmên Hikûmeta Herêma Kurdistanê li gel tîmên din ên iraqî.

**Şazdehem:** Girîngîpêdana bi navçeyên madeya 140.

**Heftehem:** Me daxwaz ji Serokwezîrê Iraqê kir ku xwediyên dukanên ku ji ber şewata bazara Lengê ya Hewlêrê ziyan dîtine, qerebû bike.

# Civata Dadwerî ya Herêma Kurdistanê: Dadgeha Federalî zêdegavî di desthilatên qanûnî de kiriye

Serokê Civata Dadwerî ya Herêma Kurdistanê dibêje, "Nabe bi çi behaneyan destkarî di madeyên destûrî yên Herêma Kurdistanê de bê kirin". Tekez jî dike, "Dadgeha Federalî zêdegavî di desthilatên xwe yên qanûnî de kiriye". Serokê Civata Dadwerî ya Herêma Kurdistanê Dadwer Ebdulcebar Ezîz Hesen îro (Çarşem, 13.03.2024) di derheqa dawî biryara Dadgeha Federalî ya Îraqê ya girêdayî pirsa kutayan de ragehandinek belav kir.

Serokê Civata Dadwerî ya Herêma Kurdistanê gotiye, "Bi çi behaneyan nabe destkarî di madeyên destûrî yên Herêma Kurdistanê de bê kirin, ji ber ku destûrî ne û divê tev alî û Dadgeha Federalî jî pê re li ser wan madeyan pabend bin û bi behaneyên nerewa arêşeyan jê re çê nekin û binpê nekin". Di pareke din a wê ragehandinê de hatiye, "Mafê Herêma Kurdistanê ye di çarçoveya dewleta Îraqê de mafên xwe yên destûrî bi kar bîne, lê Dadgeha Federalî zêdegavî di desthilatên xwe yên qanûnî de ku di destûrî de hatine kiriye, bi awayekî wesa





ku maf daye xwe desttêwerdanê di tevaya tiştên mezin û biçûk ên Herêma Kurdistanê de bike, wekî biryara hejmar 83 ya sala 2024ê ku biryara hilweşandina kutayên wê di qanûna edilandî ya hejmar 1 a sala 1992ê a hilbijartinên Perlemana Kurdistanê de daye û 11 kuersiyên perlemanê hilweşandine û hejmara wan ji bo 100 kursiyan kêm kiriye". Herwesa amaje daye, "Di wê biryarê de bi awayekî eşkere diyar dibe ku berovajî wî destûrî ye yê ku li ber sîbera wî kar dike".

570:1.QXD 17.03.2024 13:37 Page 17



# Gelo 1 û 11 û 12ê Adarê ji bona neteweya kurd tê çi wate ye?



*Îbrahîm GUÇLU*

Gelek baş tê zanîn ku meha Adarê ji bona neteweya kurd rojên dîrokî yên xweş û nexweş digre nav zikê xwe. Ji van rojên dîrokî sê roj jî, 1 û 11 û 12ê Adarê ne.

Roja reş 1ê Adara 1979-an: Dilovaniya Serokê Neteweyî û Efsanewî Mele Mistafa Barzanî…

Di 1ê Adara 1979-an de yanî beriya 45 salan Serokê Neteweyî û Efsanewî, damezrênêr û wezîrê Komara Kurdistanê ya Mehabadê, Pêşengê Şoreşa Neteweyî ya Îlonê, Damezrênêr û Serokê Otonomiya Kurdistanê Mele Mistefa Barzanî jiyan xwe ji dest da.

Wek tê zanîn di sala 1975an de di Şerê Otonomiya Kurdistanê û Rejîm û Hikûmeta Iraqê de girêdayî dilê Kurdistanê Kerkukê şerekî dijwar dest pê kir. Yekîtiya Sovyetan piştgiriya Rejîm û Hikûmeta Navendî ya Iraqê bi her awayî; bi çek û bi pere û bi pisporan piştgirî kir.

Dewleta Îranê ya Kolonyalîst û Emerîkayê jî bi xurtî nebe jî ji Otonomiya Kurdistanê û Serokê Neteqweyî re alîkar bûn. Mixabin piştî ku du dewletên kolonyalîst (Îran û Iraqê) li hevdu kirin û Iraqê di peymanê de erdê xwe yê petrolê pêşkêşî Îranê kir, Serok Mele Mistefa Barzanî û serokatiya PDKê û Otonomiya Kurdistanê ji bona ku li Kurdistanê qetlîemek û qirkirinek çê nebe, dest ji şer berda.

Ev biryara ji bona Serokê Neteweyî û Efsanewî bû derbayeke mezin û bi qehran pençeşêr (kansêr) bû. Çû li Emerîkayê derman bibe, li wir jiyana xwe ji dest da.

Dema ku kurên wî Mesûd Barzanî û Îdrasî Barzanî, Serokê Nemir ji Emerîkayê anîn Kurdistanê, Hikûmeta îraqê û Rejîma Faşîst ya Baasê îzin neda ku li Kurdistanê bê binax kirin. Loma jî, li Îranê hat binax kirin. Piştî dehan salan Serokê Neteweyî û Îdrîs Barzanî hatin li Herêma Behdînan û Berzan bûn rûniştvan.

11ê Adar a 1970êyê: Peymana 11ê Adara 1970yî û Îlankirina Otonomiya Kurdistanê…

Piştî ku Şêx Ebdûlselam Barzanî hat îdam kirin, li Başûrê Kurdistranê Şêx Ehmed û Mele Mistefa Barzanî ji Tevgera Neteweyî ya Kurdistanê re serokatî kirin. Dikarim bibêjim ku tevgera neteweyî bi serokatiya wan domdar bû. Di salên 1940-45an de jî ji bona ku li Kurdistanê neteweya kurd desthilatdar û Kurdistan xweser/otonom be li dijî Hikûmeta Navendî ya Iraqê şer domandin. Dema ku Hikûmeta Navendî bi alîkariya 3 dewletên dagirker, tevgera rizgarîxwaz ya di bin pêşengiya Melel Mistefa Barzanî de şikandin.

Ew jî bi pêşmergeyên xwe ve derbasî Rojhelata Kurdistanê bûn.

Mele Mistefa Barzanî li Rojhelata Kurdistanê jî xebata xwe neteweyî domand. Di damezrandina Komara Kurdistanê ya Mehabadê de bû damezrênêr û di hikûmetê de cî girt û dibin serokatiya Qazî Mihemed de xizmetî Kurdistanê kir.

Dema ku Komara Kurdistanê di sala 1946-an de hat rûxandin, bi daxwaza Serokkomarê Kurdistanê Qazî Mihemed, ew bi hevalên xwe ve encama meşeke dirêj û zehmet derbasî Yekîtiya Sovyetan bû. Heta sala 1958-an li Yekîtiya Sovyetan di şertên gelek zehmed de ji bona mafên neteweya kurd û rizgariya Kurdistanê xebat kirin.

Di sala 1958-an de dema li Iraqê desthilatdariya siyasî hat guhertin, Ebdûlkerîm Kasim bû serokê Iraqê, ji Mele Mistefa Barzanî daxwaz kir ku vegere Iraqê û Kurdistanê, li Iraqê guhertinan bi hev re çê bikin û makezagoneke nû bi hev re bipejirînin.

Mele Mistefa Barzanî û hevalên wî ji bona berjewendiya neteweya Kurd û mafên neteweyî yên kurd, hemû zehmetî û xeterî dan berçav vegeriyan.

Vegera Mele Mistefa Barzanî û hevalên wî li Kurdistanê bû cejneke neteweyî û şiûra neteweyî û neteweperweriyê xurt kirin. .

Li Iraqê makezagoneke nû amade kirin û qebûl kirin. Di makezagonê de hat qebûl kirin ku li Iraqê du netew (Kurd û Ereb) hene û du ziman (Kurdî û Erebî) dê bibin zimanê fermî û perwerdeyî.

Kurdistan jî dê bibe otonom û xweser.

Hezar mixabin piştî demekê Hikûmeta Navendî ya Ireaqê ev makezagona nexist jiyanê. Mele Mistefa Barzanî ji bona ku ew helwesta Hikûmeta Navendî tespît kiribû, li Kurdistanê di pêşengiya wî de PDKê amadekariya şerê neteweyî kir. Dema ku Hikûmeta Neteweyî êrîşî Kurdistanê û wan kir, di bin pêşengiya wî de Şoreşa Neteweyî ya Îlonê dest pêkir.

Şoreşa Neteweyî ya Îlonê di sala 1970-yî de zora Rejîma Baasê û Seddam bir.

Hikûmeta Navendî mecbûr bû ku bi Serokê Neteweyî Mele Mistafa Barzanî û PDKê ve Peymana 11-ê Adarê ya 1970yî qebûl bike. Kurdistan bibe otonom.

Li Başûrê Kurdistanê, piştî Komara Kurdistanê ya Mehabadê avabûna Otonomiyê bûyereke gelek dîrokî û pîroz bû.

Dewleta Federe ya Kurdistanê jî li ser wê bingehê ava bû. Nûha hêlîna hemû Kurdên çar parçeyan û dinyayê ye.

12 Adara 1971: Derbaya Leşkerî li Tirkiyeyê çêbû û li Kurdistanê zulmek û hepiskirineke kîtlewî pêk hat…

Li Tirkiyeyê di sala 1946-an de yanî di sala ku Komara Kurdistanê ava bibû, encama Şerê 2emîn ya Cîhanî û bandora Ewrûpayê "Rejîma Pirrpartitî" hat pejirandin.

Kemalîstan di sala 1950yî de di hilbijartina giştî de desthilatdariya siyasî wenda kirin. Ev yeka ji bona Kemalîstan, burokrasiya sivîl û leşkerî; yanî ji bona xwediyê dewletê bû derbayeke mezin.

Kemalîstan di sala 1954-an de jî nikarîn ku bibin desthilatdar. Loma Kemalîstan her dem xwestin ku desthilatdariyê bigrin destê xwe û desthilatdariya siyasî gorî daxwazên xwe dizayn bikin.

Ev fikrê ne demokratîk, bû sedem ku Kemalîst di sala 1970-yî de derbaya leşkerî çê bikin û Hikûmeta Menderes têk bibin û Menderes û Hikûmeta wî û serokkomar û bi sedan berpirsiyr û parlamenterên DPê hepis bikin û dageh bikin.

Di encama Dadgehê de Menderes û hevalên wî hatin darve kirin.

Piştî Derbaya Leşkerî dîsa mihafazakaran û mixalîfên Kemalîstan desthilatdariya siyasî di bin pêşengiya Sileyman Demîrel de qezenç kirin. Di heman demê de mixalefete çep û soyaslîst û Tevbera Neteweyî ya kurd û rêxistinbûna kurdan jî piştî salên şestî pêş ket.

Kemalîstan ev car jî xwestin ku sîstemê gorî pîvanên otorîter û faşîst yên Kemalîst dizayn bikin.

Ji bona vê yekê di 12ê Adara 1971-an de Derbaya Leşkerî lidarxistin.

Ev roja taybetî ji bona kurdan bû rojeke tarî. Partiya Karkerên Tirkiyeyê (TÎPê) ji bona ku di derbarê neteweya Kurd de di Kongreya xwe ya 4emîn de biryarek girîng û dîrokî girtibû, ji aliyê Dadgeha Makezagonê ve hat girtin û berpirsiyarên partiyê hatin hepis kirin. Berpirsiyarên Tevgera Radîqal ya çep (THKP û THKO û Grûba Mîhrî Bellî û Dogu Perînçek) û şoreşgerên Tirk hatin hepis kirin û ciza kirin.

Li Kurdistanê û li Metropolên Tirkan DDKO hatin qedexe kirin û hatin girtin. Berpirsiyar û endamên wan hatin hepis kirin û hatin dageh kirin. Endamên PDKê hatin hepiskirin û hatin ciza kirin. Endam û berpitsiyarên TÎPê yên kurd hatin girtin û hepiskirin.

Li Kurdistanê sînorê girtin û hepiskirinê gelek fireh bû. Serokeşîr, şêx, mele, mîr, axa, rewşenbîrên Kurd jî hatin girtin û ciza kirin. Ji bona girtina wan jî ji Şoreşa Neteweyî ya Îlonê re alîkarî û endambûna PDKê û DDKO hatin diyar kirin.

Hemû kurd li Diyarvbekîrê hatin civandin û hatin ciza kirin.

Ez jî wê demê wek damezrênêr û serokê DDKO ya Enqereyê hatim girtin û ciza kirin.

*Diyarbekîr, 13. 03. 2024*

570:1.QXD 17.03.2024 13:37 Page 18



# 121 sal di ser jidayikbûna Mela Mistefa Barzanî re derbas dibin

Roja 14ê Adarê di dîroka Kurdistanê de, xwedî cihekî taybet e ku di rojeke wek îro ya sala 1903an de, Serokê Tevgera Rizgarîxwaza Gelê Kurdistanê Mela Mistefa Barzanî



jidayik bû.

Bi vê boneyê, xelkê Kurdistanê bêyî cudahiya bîr û baweriyên xwe, netewe û olên xwe, merasîmên curbicur lidar dixin, ji ber wê jî civata niştimanî ya Kurdistanê ev roj kiriye, weke rojeke betlaneya fermî.

General Mela Mistefa Barzanî, rêberê mezintirîn şoreş di dîroka rizgarxwaziya gelê Kurdistanê de ye, di dirêjahiya temenê xwe de wî dest ji daxwazkirina mafên xelkê bernedaye, hewl ji bo bidestanîna daxwazên wî yên neteweyî daye û rêbazeke tijî daxwaziyên neteweyî û niştîmanî li pey xwe hiştiye û bûye serkirde û nimûneyeke bilind a rastgoyî û daxwaz û mafên neteweyî.

Mela Mistefa Barzanî, di qonaxeke dîrokî û çarenivîsdar de, têkoşîna li dijî dagirkerên hêzdar û bi piştevan hilbijart ku gelê kurd di serdemeke tijî êş û azar de dijiya ku ji bilî xwedê û rewayetiya doza û amadehiya zarokên gelê kurd ji bo azadiyê, ti piştevanî penayeke din jê re nebû. Lê belê bi vîneke bihêz, bi xwebawerî, rewabûna doza xwe û bi wêrekî şer ji bo miletê xwe kir û mîrateyeke mezin a têkoşînê li dijî zilm û zordariyê ji gelê kurd re hişt.

Navenda Nûçeyan (K24) – Roja 14ê Adarê di dîroka Kurdistanê de, xwedî cihekî taybet e ku di rojeke wek îro ya sala 1903an de, Serokê Tevgera Rizgarîxwaza Gelê Kurdistanê Mela Mistefa Barzanî jidayik bû.

Bi vê boneyê, xelkê Kurdistanê bêyî cudahiya bîr û baweriyên xwe, netewe û olên xwe, merasîmên curbicur lidar dixin, ji ber wê jî civata niştimanî ya Kurdistanê ev roj kiriye, weke rojeke betlaneya fermî.

General Mela Mistefa Barzanî, rêberê mezintirîn şoreş di dîroka rizgarxwaziya gelê Kurdistanê de ye, di dirêjahiya temenê xwe de wî dest ji daxwazkirina mafên xelkê bernedaye, hewl ji bo bidestanîna daxwazên wî yên neteweyî daye û rêbazeke tijî daxwaziyên neteweyî û niştîmanî li pey xwe hiştiye û bûye serkirde û nimûneyeke bilind a rastgoyî û daxwaz û mafên neteweyî.

Mela Mistefa Barzanî, di qonaxeke dîrokî û çarenivîsdar de, têkoşîna li dijî dagirkerên hêzdar û bi piştevan hilbijart ku gelê kurd di serdemeke tijî êş û azar de dijiya ku ji bilî xwedê û rewayetiya doza û amadehiya zarokên gelê kurd ji bo azadiyê, ti piştevanî penayeke din jê re nebû. Lê belê bi vîneke bihêz, bi xwebawerî, rewabûna doza xwe û bi wêrekî şer ji bo miletê xwe kir û mîrateyeke mezin a têkoşînê li dijî zilm û zordariyê ji gelê kurd re hişt.

Beşek ji westgehên jiyana Mela Mistefa Barzanî:

*Mela Mistefa Barzanî kurê Şêx Mihemed Barzanî ye û li gundê Barzan di 14ê Adara sala 1903an jidayik bû.

*Di temenê 3 saliyê de ji aliyê Osmaniyan ve ji piştî şikestina Şoreşa Barzanî Şêx Ebdulselam birayê mezin ê Mela Mistefa Barzanî hat girtin û Mistefa Barzanî û diya xwe ve li Mûslê hatin zîndanîkirin.

*Heyama 6 salan ji aliyê çend mamosteyan ve li gundê Barzan mijûlî xwendinê bû û piştre Fiqhê Îslamê xwend û çar salan zanistên olî xwend û piştre jî li Silêmaniyê hewla temamkirina xwendinê da.

* Mela Mistefa Barzanî di sala 1919an de beşdarî di tevgera Şêx Mehmûd Hefîd li Silêmaniyê ku û serperiştiya tîmeke çekdarî ya 300 çekdaran kir.

*Di sala 1920an de biryarê wî yê mezin Şêx Ehmed Barzanî wî Mela Mistefa Barzanî wek nûner dişîne Bakurê Kurdistanê ji bo serdana Şêx Seîdê Pîran bike û hevahengiyê bi şoreşê re dirust bike.

*Di navbera salên 1931 – 1932an serperiştiya hêzeke Barzaniyan dike ji bo berevanîkirina li mihwerê Mêrgesor – Şêrwan li hember hêzên Îngilîzî û di wî şerî de ji ber jîrekî û karzaniya xwe bi navûdeng dibe û dikare wî mihwerî biparêze.

* Di sala 1934an de bi Şêx Ehemd Barzanî û hin ji piyayên wî diçin Tirkiyê ji bo daxwaza mafê penabertiyê bikin û piştre vedigerin Iraqê û ji aliyê Îngilîziyan û desthilata Iraqê ya wê demê bo başûrê Iraqê tên dûrxistin û piştî 10 salan vedigere Silêmaniyê.

* Di 12ê Tîrmeha 1943an de bi hevkariya rêxistina Hîwa li Silêmaniyê karî derbasî Rojhilatê Kurdistanê bibe.

* Di heman salê de ji Îranê vedigere navçeya Barzan û hejmarek xort li dor xwe kom dike û du mehan 2 hezar çekdarên xwebexş amade dike û dikarin dest danin binkeyeke polîs li navçê.

* Di Payîza 1943an de hikûmeta Bexdayê şandekê dişîne Barzan ji bo şer bê rawestandin û Mistefa Barzanî mercê vegera tevahiya kesên sirgûnkirî û ŞêX Ehemd dike û hikûmeta Nûrî Seîd hemû mercên Mistefa Barzanî bicih tîne.

* Di sala 1943 – 1945an de Şoreşa Barzan li dijî hikûmeta Iraqê ku hikûmeta Brîtaniya piştevaniyê lê dike serî hildide careke din şoreş li navçeyeke fereh a Kurdistanê belav dibe.

* Di 22ê Çileya 1946an de beşdarî di merasîma ragihandina Komara Kurdistan li Mehabadê de kir û ji aliyê Serokomarê Kurdistanê Qazî Mihemed ve Barzanî dibe Fermandarê Artêşa Komara Kurdistan û pileya General pê tê bexşandin.

16ê Tebaxa 1946an Barzanî Partiya Demokrat a Kurdistanê damezirand û wek serokê partiyê hat hilbijartin û li tevahiya kongreyên partiyê de tevî di hinan de amade nebû jî wek serokê partî hat hilbijartin.

* Piştî şikestina Komara Kurdistanê, di sala 1947an de rêwîtiya dîrokî ber bi Sovyetê ve encam da û Barzanî amade nebû xwe radestî desthilatên Şahinşahê Îranê bike û ew ligel 500 çekdar ber bi Sovyet çûn û rûbirûyî artêşên Iraq, Îran û Tirkiyê bû.

* Roja 17ê Hezîrana 1947an Barzanî û hevalên xwe çemê Aras derbas kirinû gihîştin Sovyetê.

* Li Yekîtiya Sovyet ku Stalîn serokê wê bû, serederiya tund bi Barzanî û hevalên wî re hate kirin û piştî mirina Stalîn di sala 1953an de rewşa jiyana wan hinekî baş bû.

* Li Rûsya tevî derbaskirina temenê 45 saliyê, li Akademiya Zimanan li Moskoyê destpê kir û aborî, goegrafa, zanist û zimanê Rûsî xwend.

* Piştî şoreşa 14ê Tîrmeha 1958an, Barzanî û hevalên xwe vedigerin Iraqê û ji Besra û ta Hewlêrê camewer pêşwazî lê dikin.

* Serokomarê Iraqê Ebdilkerîm Qasim di 7ê Cotmeha 1958an pêşwazî li Barzanî û hevalên wî dike.

* Ji 11ê Îlona 1961 û ta 1975an Barzanî rêbertiya mezintirîn şoreşa çekdarî li dijî desthilatên Bexdayê kir û şoreşê 15 salan berdewam kir û tê de çendîn destkeftên netewî û niştimanî ji gelê Kurdistanê re bidest hat.

* Di 11ê Adara 1970î Barzanî û hikûmeta Iraqê li ser porjeya atonomî ji Kurdistanê re lihev dikin û bo cara yekem di dîroka Kurdistanê de şoreşeke Kurdî bi 9 salên xebatê dikare wê destkeftê ji Kurd re bidest bixe.

* Di 6ê Adara 1975an bi sedema rêkeftina Sedam Husên û Şahê Îranê Mihemed Reza li Cezaîrê, şoreşa Îlonê rastî şikandinê tê û ji ber wê Barzanî û bi hezaran Pêşmergeyên şoreşê riya koçberiyê hilbijart.

* Piştî şikestina 1975an careke din Barzanî çavdêrî û serperiştiya danîna kevirê bingehê yê şoreşê kir.

* Di 1ê Adara 1979an Mela Mistefa Barzanî li Amerîka ji ber nexweşiyê koça dawiyê kir û di 5ê Gulana 1979an li ser wesiyeta wî li bajarê Şino yê Rojhilatê Kurdistanê li ser sînorê Başûr û Rojhilatê Kurdistanê bi xaka pîroz a Kurdistanê hat spartin.

* Piştî Raperîna Adara 1991an, termê Mela Mistefa Barzanî û Îdrîs Barzanî li aramiya xwe ji Rojhilatê Kurdistanê bo Herêma Kurdistanê cihê jidayikbûna xwe hat veguhastin û li navçeya Barzanî bi xakê hatin spartin.

* Di heyama jiyana xwe de du caran Mela Mistefa Barzanî rastî hewlên terorkirinê hat û mocîze hat rizgarkirin, yek di 29ê Îlona 1971an û ya duyem jî di 16ê Tîrmeha 1972an de bû, lê her du caran jî bo berjewendiya gelê Kurdistanê, parastina aştî û aramiyê Kurdistanê dirustnebûna şer, rêkeftina Adara 1970î ya bi Bexdayê re hilneweşand.

# Viyan Sebrî: Ya ku li beranberî fermanberên Herêma Kurdistanê tê kirin berovajî destûrî ye

Seroka Firaksiyona PDKyê tekez dike, "Ya ku li beranberî fermanberên Herêma Kurdistanê tê kirin berovajî destûrî, lihevkirinên siyasî û qanûna bud-



ceyê ye". Herwesa dibêje, "Xwecihkirina mûçeyên fermanberan berovajî destûrî ye".

Seroka Firaksiyona PDKyê li Perlemana Îraqê Viyan Sebrî îro (Çarşem, 13.03.2024) ji K24ê re ragehand, "Ev nêzî du salan e û taybet piştî pejirandina pirojeqanûna budceya giştî ya federalî li Hezîrana sala 2023ê, tevaya mafên Herêma Kurdistanê tên binpêkirin, yek ji wan jî mafên darayî yên fermanberên Herêma Kurdistanê ye".

Seroka Firaksiyona PDKyê amaje jî da, "Ev çend meh in Hikûmeta Îraqê bi behaneyên cuda cuda şandina mûçeyên fermanberên Herêma Kurdistanê vedihêle. Me hemî daxwaziyên wan bi cih anîne, lê her car behaneyeke nû digirin. Vê mijarê gelek vekêşa û me hedara xweragirtinê nemaye".

Viyan Sebrî tekez jî kir, "Pirsên siyasî û qanûnî têkelî yek tên kirin. Pirsa budce û mûçeyan pirseke qanûnî ye û li perlemanê bi dengê piraniya firaksiyonan hatiye pejirandin. Tevî ku me gelek têbînî jî li ser hebûn, me Kurdan jî deng li ser wê pirsê da, lê niha ew mijar hatiye siyasîkirin. Mehekê mûçeyan dişînin û yekê naşînin".

Navbiriyê eşkere jî kir, "Eger tevaya firaksiyonên Kurdistanî di dema dengdanê de ji bo qanûna budceya giştî ya federalî ji bo her sê salên 2023, 2024 û 2025ê yekdeng ban, rewş bi vî awayê niha nedibû".

Seroka Firaksiyona PDKyê li ser mijara vekirina hejmarên bankan ji bo mûçexur û fermanberên Herêma Kurdistanê got, "Daxwaza Wezareta Darayî ji bo xwecihkirina mûçeyên fermanberên Herêma Kurdistanê berovajî destûrî ye".

Viyan Sebrî tekez jî kir, "Ya ku niha li beranberî fermanberên Herêma Kurdistanê û mafên darayî yên wan tê kirin berovajî destûrî, lihevkirinên siyasî û qanûna budceyê ye".

# Karayilan: Em dê Newrozê mizgîniyekê bidin gelê xwe

Endamê Komîteya Rêveber a Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) Murat Karayilan got, "Wekî rêve-



beriya tevgera me, vê Newrozê, di nava çend rojên pêş de em dê mizgîniyekê bidin gelê xwe."

Murat Karayilan bêyî ku li ser naveroka "mizgîniyê" ti hurgiliyan bide, da zanîn ku dê di nava çend rojan de mizgîniyekê ragihînin.

"Em dê mizgîniya xwe bi daxuyaniyeke nivîskî ragihînin" Li gorî nûçeya ANHAyê, Murat Karayilan wiha axiviye: "Wekî rêveberiya tevgera me, vê Newrozê, di nava çend rojên pêş de em dê mizgîniyekê bidin gelê xwe.

Em dê mizgîniya xwe bi daxuyaniyeke nivîskî ragihînin.

**"Dê hîmekî xurt ava bike"**

Ev mizgînî dê di têkoşîna me de hîmekî hîn xurt bi xwe re ava bike.

Di bilindkirina têkoşînê de dê bibe amûreke pir girîng û roleke xwe dê hebe. Ev mizgînî dê di rojên pêşiya me de bê îlankirin û weşandin. Di vê çarçoveyê de careke din Newroza tevahiya gelê me û tevahiya gelan bi dil û can pîroz dikim."

570:1.QXD 17.03.2024 13:37 Page 19



# Ко дню рождения Мустафы Барзани



Имя Мустафы Барзани хорошо известно и за пределами Курдистана. Не имея в своем распоряжении танковых армий и воздушных флотов, он мог проявлять свои военные таланты лишь на ограниченном театре партизанской войны; будучи лидером национально-освободительного движения, он не мог произвести революцию, чтобы потом уже в качестве главы государства являть себя миру. Однако, при всей ограниченности средств и объективных возможностей, ему удалось фактически создать на севере Ирака независимое курдское государство, просуществовавшее полтора десятилетия. Это достижение, без преувеличения, ставит его в ряд наиболее выдающихся деятелей XX века. Привлекательной чертой Барзани, как личности, было то, что он был совершенно лишен обычно свойственной политикам моральной неразборчивости. Стремление достигать целей исключительно благородными средствами редко встречается у крупных политиков, но, вопреки предрассудку, вовсе не противопоказано им: таким был в польской истории Костюшко, в древней русской - Владимир Мономах. Барзани стоял в том же ряду: его личное благородство одинаково признавали и друзья, и враги, что вовсе не мешало ему быть успешным политиком.

Мустафа Барзани родился в 1903 году в селении Барзан недалеко от нынешней иракско-турецкой границы, в семье местного шейха Мухаммеда. Шейх Мухаммед вскоре умер (по некоторым утверждениям - после, а по некоторым - еще до рождения Мустафы), и племя барзанцев возглавил старший брат Мустафы, шейх Абдель-Салям. Свободолюбивый шейх, пользовавшийся непререкаемым авторитетом среди своего племени, возглавил несколько восстаний барзанцев против турок; после поражения последнего из них (в марте 1914 г.) он бежал в Россию, некоторое время прожил в Нахичевани под защитой русских властей, но при известии о начале мировой войны вернулся в Курдистан, надеясь организовать всеобщее антитурецкое восстание. Планы его не удались: он был схвачен турецкими агентами (курдами же), и повешен в Мосуле. Власть над племенем принял его 18-летний брат, шейх Ахмед.

В такой атмосфере рос юный Мустафа - свободолюбия, патриотизма и религиозности, понимавшейся, впрочем, совсем иначе, чем современными фундаменталистами, и лишенной всяких признаков фанатизма и нетерпимости (шейх Абдул-Салям, например, был в прекрасных отношениях с христианами-ассирийцами и даже скрывался некоторое время в ассирийском монастыре). Юный Барзани успешно учился в медресе и за свои познания получил от соплеменников уважительное прозвище "Молла Мустафа". По воспоминаниям знавших его, он прекрасно знал наизусть и любил классическую арабскую и персидскую лирику. Этим, в целом, ограничилось его образование, носившее традиционный средневековый характер и никак не подготовившее его к той роли на авансцене XX века, которую он призван был сыграть.



После английской оккупации Месопотамии в 1918 году, юный Мустафа принимал участие в восстаниях против англичан. Другим событием его юности, которым он очень гордился, был поход для спасения от резни родственников знаменитого армянского героя Андраника (Андраник был знаком с шейхом Абдель-Салямом в России, и впоследствии обратился за помощью к его брату, барзанскому шейху).

В 1932 году барзанцы во главе с шейхом Ахмедом подняли новое восстание, на этот раз против свежеиспеченного Иракского королевства. В этом восстании Мустафа впервые занимал командную должность и впервые одержал победу: его отряд сумел разгромить колонну иракских войск. В конце концов, восстание было подавлено с помощью английской авиации, а барзанцы бежали в Турцию. Они вернулись под обещание амнистии, но Багдад, как это с ним постоянно случалось, нарушил свои обещания: вся верхушка племени была арестована и отправлена в ссылку.

В 1943 году Мустафа, находившийся в Сулеймании, бежал из ссылки с помощью членов патриотического общества "Хива" ("Надежда"). Собрав в Иране небольшой отряд, он вторгся в Барзан, где тотчас началось всеобщее восстание. Все полицейские посты, созданные в районе, были захвачены и разоружены. Барзани требовал автономии для курдов. Багдад как всегда понадеялся на помощь англичан, но англичане, занятые мировой войной вмешаться отказались, предложив иракцам пойти на временный компромисс. В результате, на протяжении двух лет Барзани был избавлен от борьбы с Ираком, а Барзан обрел фактическую полунезависимость. Однако переговоры о его автономном статусе затягивались. Тем более что война кончилась, и англичане смогли перебросить в Ирак авиацию и бронетехнику. Когда в августе 1945 года иракцы, при поддержке англичан, начали массированное наступление, стало ясно, что выдержать барзанцы не могут. И тогда все племя, снявшись с места, ушло в Иран.

В Иране в это время, советские войска оккупировали Азербайджан, а к югу от советской зоны оккупации, на территории провинции Курдистан, возникла "ничейная зона" со столицей в Мехабаде. Там распоряжался местный судья и курдский патриот, Кази Мухаммед. Барзани заранее, еще весной 1945 года, завел сношения с представителями советских оккупационных властей, которые обещали ему свое покровительство. С другой стороны, Кази Мухаммеду как нельзя кстати было появление на его территории таких прославленных воинов, как барзанцы. Поэтому, когда в январе 1946 года он провозгласил в Мехабаде Курдскую республику и поднял над зданием местной администрации флаг Курдистана - Барзани был немедленно назначен главнокомандующим армии новой республики.

Мехабадская республика просуществовала менее года. Вывод советских войск из Азербайджана означал для нее смертный приговор: в декабре 1946 г. иранцы вошли в Мехабад. Кази Мухаммед передал Барзани флаг Курдистана, но уйти с ним отказался: он остался в городе, чтобы предотвратить массовые репрессии (впоследствии он был судим и повешен). Барзанцы оказались в критическом положении. И тогда Барзани принимает решение: всему племени возвращаться в Ирак, он же с мужчинами-добровольцами попытается пробиться в Советский Союз - бывший тогда страной мечты для всего "угнетенного Востока".

Поход Барзани и 500 добровольцев к Араксу стал у курдов уже легендой. Барзани и 500 его бойцам противостояли армии трех государств: Ирана, Ирака и Турции. После тяжелых маршей по бесплодным горным хребтам на иракско-турецко-иранской границе, где приходилось питаться травой, небольшой отряд Барзани спустился в долину, где его поджидала сосредоточенная армия "победителей Азербайджана". Барзани дважды проскользнул в стыки между вражескими частями, а в третий раз, под Маку, был принужден к бою - и наголову разгромил шахские силы. После этого, курды уже без особых проблем достигли пограничного Аракса и 17-18 июня 1947 года переправились на территорию Нахичеванской ССР. Барзани перешел через реку последним.

Однако, на родине всех трудя-



щихся Барзани и его людей ожидали новые испытания. Судя по всему, барзанцы стали жертвами изгибов сталинской внешней политики, осложненных межведомственной борьбой между МВД и МГБ и, не в последнюю очередь, субъективными факторами. По крайней мере, сами барзанцы были уверены, что все преследовавшие их беды были связаны с влиянием хозяина Советского Азербайджана Мир Джафара Багирова, сразу невзлюбившего Барзани за его гордый и своенравный нрав.

В общих чертах судьба Барзани и барзанцев при жизни Сталина выглядит так: сначала их усиленно обучали в военном лагере недалеко от Баку, на Апшеронском полуострове; затем неожиданно переместили в Узбекистан, где первое время также обучали, после чего расформировали и раскидали на спецпоселения по совхозам. Сам Барзани был сослан в забытый богом рыболовецкий поселок Муйнак на Аральском море. Он одно за другим писал оттуда письма Сталину - это не давало никакого результата, пока ему не удалось переправить письмо непосредственно с человеком, летевшим в Москву. И только после того, как письмо было опущено в почтовый ящик у Спасской башни, произошли последствия: курды были поселены вместе под Ташкентом, туда же был доставлен Барзани. Надо полагать, письмо попало в поле зрения руководства МГБ, которое имело на барзанцев свои виды: согласно генералу Судоплатову, их собирались использовать в случае войны для диверсии против нефтяных месторождений в Северном Ираке. Барзани это положение однако не устраивало: он с момента своего появления на советском берегу настойчиво добивался встречи со Сталиным, которого хотел просить об устройстве его барзанцев на учебу. Услышав о смерти Сталина, Барзани решает, что его час настал: он тайно садится на самолет в Ташкенте и летит в Москву. По курдскому рассказу, подойдя к Спасским воротам, он принялся колотить в них кулаком, объяснив подбежавшим охранникам: "Это стучит курдский народ!". В результате, в гостинице "Москва" ему организовали встречу с высокопоставленными офицерами КГБ, а после этого представили его Хрущеву. Хрущев, не чуждый, как известно романтики, взял Барзани под личное покровительство, объяснив все происшедшее с барзанцами кознями официальных "врагов народа": Багирова и "подлеца Берии". В результате те из барзанцев, что помоложе, были направлены на учебу в советские ВУЗы, сам же Барзани получил квартиру в Москве и стал обучаться в Военной академии им. Фрунзе и в ВПШ.

Барзани прожил в Москве ровно 5 лет. Утром 14 июля 1958 года он был разбужен звонком своего "куратора" из ЦК, Волошина, сообщившего о свержении монархии в Ираке. В истории Ирака и в биографии Барзани открылась новая глава.

Барзани спешно вернулся в Ирак на самолете и был торжественно встречен, как герой борьбы с королевским режимом. Остальные барзанцы, многие - вместе со своими русскими женами и детьми от них, отплыли из Одессы на теплоходе "Грузия", породившим кстати немало толков (утверждали, будто на нем везут советских боевиков в подкрепление новому иракскому диктатору Касему). Вернувшись, Барзани немедленно взял в свои руки руководство Демократической партией Курдистана (ДПК), председателем которой он формально числился с момента ее основания в 1946 году. ДПК была тогда одной из двух массовых партий Ирака - совместно с Компартией, с которой она сотрудничала в Багдаде, но вела жестокую борьбу за монопольное влияние в Курдистане. Революционный режим, возглавлявшийся генералом Абдель-Керимом Касемом, первое время раздавал авансы всем, не исключая и курдов. Более того, после попытки военного путча арабских националистов в Мосуле и покушения на Касема баасистов (в котором важную роль сыграл молодой Саддам Хусейн) одно время казалось, что курды и коммунисты вообще являются единственной опорой Касема. Однако Касем не только не удовлетворил требований курдов предоставить им автономию, но со временем начал проводить все более и более шовинистическую политику. Дошло до того, что было запрещено даже официальное употребление слова "Курдистан" (вместо него следовало говорить "Северный Ирак"), и даже сорт "Курдистанской" пшеницы приказом министра сельского хозяйства был переименован в "Северную пшеницу". В этих условиях, Барзани отправился в Москву (официально - на Ноябрьские праздника 1960 года), где провел длительные и сложные переговоры о поставках курдам оружия.

*(Продолжение следует)*

570:1.QXD 17.03.2024 13:37 Page 20


# ДИПЛОМАТ

KÜRD DÎPLOMAT

№ 10 (570) 10 - 17 март 2024-год ОБЩЕСТВЕННО-ПОЛИТИЧЕСКАЯ ГАЗЕТА


## Курдские лидеры требуют справедливости и компенсаций жертвам Халабджи

В 36-ю годовщину химической атаки на Халабджу курдские лидеры вновь потребовали справедливости и компенсации жертвам прошлых злодеяний, совершенных против курдского народа.

Курдский лидер Масуд Барзани, президент "Демократической партии Курдистана" (ДПК), осудил нарушение иракским государством прав курдов, подчеркнув продолжающееся подавление, с которым сталкивается народ. Он подчеркнул важность признания трагедии в Халабдже как свидетельства жестокости, которую пережил Курдистан.

Президент Курдистана Нечирван Барзани выступил за всестороннюю компенсацию жертвам, призвав иракское правительство выполнить свои обязательства и обеспечить



справедливость для тех, кто пострадал от разрушительного нападения. Он почтил память мучеников Халабджи и выразил солидарность с их семьями.

Премьер-министр Масрур Барзани подчеркнул, что важно помнить о зверствах, совершенных против курдского народа, и напомнил об обязанности иракского правительства выплатить компенсации жертвам. Он подчеркнул продолжающуюся несправедливость, с которой сталкивается курдский народ, и призвал постоянно напоминать о преступлениях, совершенных против него.

Химическая атака в Халабдже, совершенная 16 марта 1988 года, является мрачным свидетельством ужасов, совершенных иракскими войсками под руководством Саддама Хусейна во время ирано-иракской войны, когда было применено химическое оружие против курдского города Халабджа, в результате чего погибло более 5000 мирных жителей и было ранено более 10 000 человек.

Это нападение с применением горчичного газа и нервно-паралитических веществ, было направлено в первую очередь против женщин и детей. Оно оставило неизгладимый шрам в коллективной памяти Иракского Курдистана. Нападение признано на международном уровне как акт геноцида и вопиющее нарушение прав человека и международного права.

"Массовые убийства и геноцид в Халабдже всегда останутся открытой раной. Мы будем стараться коллективно помнить мучеников и сохранять их память живой", сказал



премьер-министр Барзани, подчеркнув важность единства в противостоянии тем, кто стремится уничтожить курдскую нацию: "Менталитет, лежащий в основе кампаний по уничтожению курдской нации, все еще существует, и мы все должны противостоять этому".

Несмотря на то, что прошло 13 лет с тех пор, как иракский парламент признал химическую атаку геноцидом, иракское правительство, как преемник прежнего режима, отказывается выплатить компенсации жертвам.

16 марта 1988 года иракские военные самолеты обрушили химический газ на Халабджу, в результате чего погибло более 5000 невинных мирных жителей и еще тысячи получили ранения. Большинство жертв составили дети до 18 лет. Сотни семей потеряли своих детей во время хаоса бегства.

Региональное правительство Курдистана



(КРГ) неоднократно призывало федеральное правительство выплатить компенсацию жертвам этого и других злодеяний Саддама Хусейна, включая печально известную кампанию "Анфаль", которая унесла жизни примерно 180 000 курдов.

В 2002 году расследования выявили соучастие многочисленных международных компаний в помощи бывшему иракскому режиму "Баас" в приобретении химического и биологического оружия. В 2005 году голландский бизнесмен Франс ван Анраат был приговорен к 15 годам тюремного заключения за поставку химикатов, использованных при нападении на курдский город, а в 2010 году арест и казнь Али Хасана Маджида, известного как "Химический Али", непосредственно командовавшего атакой, ознаменовали решающий шаг на пути к наказанию преступников.

## REHMA XWEDÊ LÊBE

### PROFESSOR ŞÎRÎNDÎL ALÎŞANOV KOÇA DAWÎ KİR



Kurdekî ji Azerbaycanê, profesor, fîlologê Sovyetê û Azerbaycanê, doktorê zanistîyê fîlolojîyê, profesor, serokê beşa ,,Edebîyata Sedsala 20-an,, li Akademiya Zanistî ya Azerbaycanê, serokê weşanxaneya ,,Sabah,,ê, rêdaktorê sereke ya rojname ,,Êlm,, (,,Zanistî,,), dîrektorê navenda ,,Elm,, , redaktorê kovara ,,Zanîn û jîyan,, Şîrîndîlê Hasan Alişanov îro 14.03.2024 li bajarê Bakûyê koça dawî kir.

Şîrîndîl Alişanov di sala 28.10.1952'ê li gundê Mola Ehmedlî, yê herêma Laçînê (Qezayê Kurdistanê ya bere) hatiye dinyayê. Birayê helbestvan û zanyarê kurd û azerî Huseyîn Kurdoxlû ye.

## Allah rəhmət eləsin

Kürd xalqının dəyərli oğlu, Azərbaycanımızın fəxri, filologiya elmləri doktoru, professor Şirindil Alışanlı vəfat edib. Azərbaycan Kürdlərinin İctimai Birliyi və ,,Diplomat,, qəzetinin redaksiya heyəti Şirindil müəlimin vəfatı ilə bağlı ailəsinə və yaxınlarına başsağlığı verir və Allahdan səbr diləyir.

Allah rəhmət eləsin.

Şirindil Həsən oğlu Alışanlı 1952-ci ildə anadan olub. 1970-1975-ci illərdə Azərbaycan Dövlət Universitetində (indiki Bakı Dövlət Universitetində) təhsil alıb, Filologiya fakültəsində ədəbi tənqid üzrə ixtisas kursunu bitirib. 1977-1980-ci illərdə SSRİ Elmlər Akademiyasının M.Qorki adına Dünya Ədəbiyyatı İnstitutunda təhsilini davam etdirib, XX əsrin görkəmli estetiki Yuri Borevin rəhbərliyi ilə 1981-ci ildə namizədlik dissertasiyasını müdafiə edib.

1976-cı ildən etibarən AMEA-nın Nizami adına Ədəbiyyat İnstitutunda çalışıb. Elmi işçi, elmi katibi, Ədəbiyyat nəzəriyyəsi bölməsinin müdiri, Tarixi poetika şöbəsinin, XX əsr (sovet dövrü) Azərbaycan ədəbiyyatı şöbəsinin müdiri olub.

1991-ci ildə “Sabah” nəşriyyatını təsis edib, 1993-1998-ci illərdə “Elm” qəzetinin baş redaktoru olub, 1997-ci ildən 2014-cü ilə qədər “Elm: Redaksiya, Nəşriyyat və Poliqrafiya Mərkəzi”nin direktoru olub. Ondan artıq kitabın müəllifidir. 200-dən artıq elmi məqaləsi çap edilib.

Bir sıra beynəlxalq elmi jurnalların və çoxcildlik nəşrlərin redaksiya heyətinin üzvü olub. Rəhbərliyi və redaktəsi ilə çoxsaylı elmi əsərlər və antologiyalar nəşr edilib. Yetmişdən artıq kitabın redaktoru olub. Rəhbərliyi ilə 10 nəfər fəlsəfə üzrə elmlər doktorluğu müdafiə edib. Bir elmlər doktorluğu, 20 fəlsəfə doktorluğu dissertasiyasına opponentlik edib.

O, həmçinin Azərbaycan Yazıçılar Birliyinin və Azərbaycan Jurnalistlər Birliyinin üzvü, Estetika və Azad sənətlər Akademiyasının akademiki (Rusiya) idi.


TƏSİSÇİ VƏ BAŞ REDAKTOR:
TAHİR SÜLEYMAN
XÛDAN ÎMTÎYAZ Û SERNIVÎSAR:
TAHÎR SILÊMAN
УЧРЕДИТЕЛЬ И ГЛАВНЫЙ РЕДАКТОР:
ТАХИР СУЛЕЙМАН
Tel: +994 50 352-33-18

Baş redaktorun müavini:
Tariyel Cəlil
Xüsusi müxbir:
Nofəl Ədalət
Региональный корреспондент:
Усуб Тейфур
Müəlliflərin mövqeyi ilə redaksiyanın mövqeyi üst-üstə düşməyə bilər.

Ünvan: Bakı şəhəri Az1040, küçə S.Mehmandarov ev 25, mənzil 17
Navnîsan: Bakû Az1040, soqaq S.Mêhmandarov xani 25, mal-17
Адрес: Баку Az1040, улица С.Мехмандаров дом 25, кв.-17

Qəzet “Diplomat” qəzetinin bilgisayar mərkəzində yığılıb səhifələnib və “Mətbuat” mətbəəsində çap olunmuşdur.
e-mail: hewler@mail.ru
Şəhadətnamə: NFŞ 005004966
BUSB-un Sabunçu rayon filialı
VÖEN 1800061582
H/h 438010000
Sifariş: 1500